

kovara hunerî, çandî û lêkolînî ya kurdên anatoliya navîn

bîrnebûn

ZIVISTAN 2006

"KAMBAXA VÊ SIRGÛNÊ"

Di folklora kurdî de stranêner xerîbiyê



29

Tesîra barkirinê li ser zimên

Elbistan - Pazarcık yöre tarihi ve kültürü üstüne

"Ağıtlama - şiir" in sesi Bejan Matur`la konuşma

bîrnebûn

Tidskriften utkommer 4 nummer per år.
Sê mehan carê derdikeve/ Üç ayda bir çıkar.

Utgas av Apec-Förlag AB

Hejmar 29, zivistan-2006

Ansvarig utgivare

Ali Çiftçi

Redaksiyon

A. Çiftçi, Dr. Mikailî, H. Erdogan, M. Bayrak, İ. Türkmen
M. Duran, Muzaffer Özgür, Nuh Ateş, Sefoyê Asê, Vahit Duran

Adress

Navnişana li Swêdê

Box: 8121, SE 163 08, Spånga/Sverige

Telafaks: 0046-(0)8-761 24 90

E-post

info@birnebun.com

Internet

www.birnebun.com

Navnişana li Almanyayê

Muzaffer Özgür/Bîrnebûn

Postfach 900348 , 51113 Köln/Almanya

Tfn: 0049-(0)172 298 24 51

Bîha/Fiyati

Europa: 5 Euro • Türkiye: 2 500 000 TL.

Abone (ji bo du salan - 2 yıllık bedeli):

Swêd: 400 SEK • Europâ: 40 Euro

İsveç hesap numarası

(Bîrnebûn) postgiro: 468 65 12-7

Almanya hesap numarası

M. Özgür, Stichwort "Bîrnebûn" Deutsche Bank-Köln

BIC: DEUTDEDBKOE

IBAN: DE66 3707 0024 0591 2662 00

Konto Nr: 5912662 BLZ: 37070060

Belavkirin / Dağıtım

Türkiye

Ankara:

Dipnot Kitebevi, Selanik Caddesi No: 82/32

KIZILAY / ANKARA

Tfn: 0312-419 29 32

Anatolia Muzik Center

Cumhuriyet Mah. Turan Cad. No: 29 A

Polatlı-Ankara

Tfn.: 0090-312-622 94 36

İstanbul:

Selahattin Bulut/Medya Kitapevi

Istiklal Caddesi, Elhamra Pasaj No: 258/6, Beyoğlu

Çap / Baskı

Apec-Tryck AB

ISSN 1402-7488




Tabloyek ji Filiz Ateş

Her nivîskar berpirsiyarê nivîsa xwe ye.
Mafê redaksiyonê heye ku nivîsen ji Bîrnebûnê
re têñ, serrast û kurt bike. Nivîs ger çap nebin jî,
li xwedî nayêñ vegerandin.

Waqfa Kurdên Anatoliya Navîn li Swêdê û Komela
Ziman li Almanyayê piştgirên kovarê ne.

NAVEROK / İÇİNDEKİLER



Wêneya berg: Filiz Ateş

- 2 Sersala nû, hêvî û daxwazên nû! - Ali Çiftçi
- 4 Nûçe
- 7 Gundiyên Şerefliyê li Danîmarkê hatin ba hev - Ronî Zelalxwîn
- 9 Hevpeyivek bi serokê SER-DERê, Doğan Durukan re - Muzaffer Özgür
- 12 Bi radyoya Zayele re hevpeyivek - Ali Çiftçi
- 15 Kurdistan, durûtiya dezgehêن navnetewî û em - Memo Şahin
- 22 Dûrik(çarînêن) gel ji hêla Sarizê - Berhevkar: Mehmet Bayrak
- 28 Sira Hemê - Nuh Ateş
- 31 Siya kurd li Thusisê - Yusuf Yeşilöz
- 33 Koma hawara kurdî
- 36 "Kambaxa vê sirgünê" - Rohat Alakom
- 46 Tesira barkirinê li ser kurdên Anatoliya Navîn - Nuh Ateş
- 48 Helbest - Seyfi Doğan, Ramazan Kesen, Xizan Şîlan
- 52 Vejandina dîroka rasteqîn "Arîstokratên Kurd: Torîn" - Dr. Zorab Aloian
- 59 "Ağıtlama- şiir" in sesi Bajan Matur`la konuþma - Mehmet Bayrak
- 63 Ankaralı Kürt Cemali`ye Ağıt
- 64 Ressam Filiz Ateş ile söyleşi - Mem Xelîkan
- 69 Elbistan - Pazarcık yöre tarihi ve kültürü üstüne - Mehmet Bayrak

Sersala nû, hêvî û daxwazên nû!

S ersala we ya nû pîroz be! Bi destpêka sersalê jiyanekê nû jî destpê dike. Bi jiyanekê nû re hêvî û daxwazên nû jî li meriv peyda dibin. Dewlet, organizasyonên navnetaewî, şirket û partiyên siyasi, li gor dem û pêşketinênu ku li rûyê dinyayê peyda bûne, bernameyên nû didin pêş xwe û li gor wan îmkanênu ku peyda bûne, xwe ji nû ve organize dikan.

Dema em li rewşa xwe dinêrin, em dibînin ku di hemû ew guhertin û îmkanênu ku nû tênu holê, însanênu me di warê material û kar de hindik be jî, li gor zanebûnu û îmkanênu xwe, di jiyanu xwe de, hinek guhertinan dikan. Lê dema em di warê çand (kultur), ziman û netewî de lê dinêrin, em dibînin ku tu guhartin û destkeftiyênu ku hene bala wan nakişine!...

Di warê çand û ziman de li gor dema salên 1960–1980î, îmkanênu pir mezin peyda bûne; eger em ji dil bixwazin, êdî tu mineta me, ne ji dewleta û ne jî ji yên serdest maye. Em li gor van peşketinênu teknîkiyênu ragîhandinê, li kuderê dinê be, dikarin hem zimanê xwe baş fêrbibin, hem jî hînê zarokênu xwe bikin û çanda xwe bi riya zimênu biparêzin û pêşda bibin.

Em hêvî dikan ku însanênu me di sala nû de van îmkanênu ku hatine peyda kirin, bînin ber çavan û xwedî

li ziman û çanda xwe derkevin, dakû sibê li hember zarokênu xwe serberjêr nebin!...

Di van salên dawî de piraniya gundiyyêni ji kurdên Anatoliyê komele an waqfênu gundênu xwe ava kirin. Piraniya van gundan malperênu bi navê gundênu xwe jî vekirine. Meriv êdî dibîneku xwedî li gund û warênu xwe derketin bûye edetek û her ku diçe însanênu me dibin xwedîyê rêxistinan. Bi rêya van komelan û waqfan tênu ba hev, ji bo pêştabirin û parastina çanda xwe hewl didin. Helbet ev karan, karênu pîroz in. Her çiqas bi derengî be jî, ev xebatan, dê di peşketina civaka van gundan de roleka pir pozitîf bigrin.

Ji ber ku piraniya van rêxistinan li derweyî welêt tênu ava kirin, di nav van de daxwaz û meylênu kurdî zêde ne. Lê dema em hinekî bi hûr û kûr li ser kar û aktiviteyênu ku ji aliyê van komelênu gundan ve tênu kirin, bifikirin; em bi rihetî dikarin bibîn, di aliyê ziman de kemasîyênu mezîn jî dibin. Gelo ci ne ew kemasîyênu ziman?

1) Zimanê ku di şev û şahiyênu de tê deng kirin, pir caran bi tirkî ye.

2) Di piraniya malperênu van gundan de mesaj û gotar bi tirkî tênu nivisîn.

3) Navênu tirkî li rêxistinênu xwe dikan.

Em dê zêde li ser sebeba ku ji bo çi tirkî tê bi deng kirin dûr û dirêj rane-westin. Lê ya girîng ku piraniya wan bi zimanê xwe bi hev re deng dikin û baş jî pê dizanin. Dîsan jî dema axaftinekê an mesajekê, her çiqas dengên zimanê tirkî baş pê nizanibin jî, tu dinêrî her bi zimanê tirkî deng dikin. Bi ya me, ew fêrbûnek e ku ji kompleksa xwe biçûk dîtinê tê. Ev mesela, mesela xelkê bindest e. Lê, em pê dizanin ku ev hîsêni wiha meriv dikare li ser xwe bavêje.

Hêvî û daxweza me ji van hemû rêx-istinêñ gundêñ Anatoliyê û malperêñ wan ev e; ku hêdî zimanê kurdî bi kar bînin dakû bi xwe nebin hevkarê asîmîlekirina zarokêñ xwe. Hêdî wext hatiye divê em ji kirinêñ xwe berpirs bin û zarokêñ xwe bi destê xwe fêrî kompleksa biçûk bûnê nekin!

Ji bo piraniya însanêñ li welatêñ xerîbiyê sersal û cejnêñ olî rolên xwe yên taybetî hene. Li xerîbiyê hesreta nas û dostan, dê û bavan, xwîşk û bira, ya bi salan, bi demeke pir kurt be jî, di vê meha sersalê de hinek kêm di-be. Îmkana ku li hev bigerin an ziyareta hevûdû bikin, peyda dibe. Ji bo piraniya însanan demeke dilşahî û bextewariyê ye.

Ji bo însanêñ me yên ji Anatoliyê jî maneyeke vê ya taybetî heye. Ji ber qedera wan ya "koçberiyê" malbatek tenê jî nemaye ku merivêñ xwe li xerîbiyê tunebin!... Koçberiya koçberiyê her bi xwe re koçberiyêñ nû tîne. Gotineka skandînavî heye, dibêje: "Yêki ku carêkê bû koçber, herdem koçber e." Ev gotina ji bo kurdêñ me yên ji Anatoliyê

û qedera wan ya koçberiyê rast e û rast li hev dike.

Ji ber koçberiyê, bi temamî nebejî, giraniya naveroka vê hejmarê li ser sîrgûn û xerîbiyê ye. Bi nivîsêñ li ser sîrgûniyê, helbest û stranêñ xerîbiyê ev hejmara hatiye dagirtin.

Rohat Alakom di nivîsa xwe ya bi navê "Kampaxa vê sîrgûnê" de, stranêñ xerîbiyê şirove dike. Wî, stranêñ ku piraniya însanêñ me dikarin xwe tê de bibînin, bi çend wêne û karîkaturan ve neqîsandîye.

Nuh Atêş jî bi sernivîsa *Tesîra barkirîñ li ser zimanê kurdêñ Anatoliya Navîn-II* li ser babeta koçberiyê radiweste.

Memo Şahîn bi sernivîsa *Kurdistan, durûtiya dezgehêñ nawnetewî û em* li ser rewşa organêñ nawnetewî û rastiya politîkaya wan ya li ser kurd û Kurdistanê tinê rojevê.

Mehmet Bayrak bi helbestvan Bejan Matur re û Mem Xelîkan jî bi hunermend Filiz Ateş re sohbetek kiriye. Hûn dê wan herdu hevpeyvînan bi zimanê tirkî bixwînin.

Mehmet Bayrak li ser çand û dîroka Elbistan-Pazarcik hin agahdariyan pêşkêşî xwendevanan dike.

Dost û emekdarêñ kovara me Bekir Dari û Şewket Özcan, di sala çûyî de dayîkêñ xwe winda kirin. Bila serê wan û malbatêñ wan sax be! Gorêñ dayîkêñ wan bihişt bin!

Bimînin di xêr û xweşiyê de!

Pêşbirika çîrokan a kurdên Anatoliya Navîn

Şertên beşdarbûnê:

1. Divê çîrok bi kurdî be.
2. Her nivîskar bi tenê dikare bi çîrokekê xwe beşdar bibe.
3. Çîrok divê heta niha li tu ciheke nehatibe weşandin.
4. Çar nushêن çîrokê, heger hebe bi dîsketê, kurtejiyan û adresa xwe heri dereng 31. 07. 2006an ji vê adresa jêrîn re bişîne:
Ziman, C/o Duran
Albertstr. 2 35576
Wetzlar /Almanya

Endamên jûriyê:

Ali Çiftçi,
Nûh Ateş
Yusuf Yeşilöz

Xelatên pêşbirikê

Yekemîn	500 €
Duyemîn	300 €
Sêyemîn	200 €

Encama pêşbirikê di 30ê îlona 2006an de tê ûlan kirin. Tarîx û cihê xelatê piştre tê diyarkirin û xelat bi ahengek (merasimek) li xwedîyên wan tê belav kirin. Çîrokên ku xelatê bigrin dê di kovara Bîrnebûnê de bêñ weşandin.

Orta Anadolu Kürtleri Öykü Yarışması

Katılım koşulları:

1. Kürtçe ile yazılmış olması,
2. Katılımcılar sadece bir öykü ile katılabilirler.
3. Yarışmaya katılacak öyküler daha önce yayınlanmamış olması
4. Öyküler 4 nüsha ve varsa disketleri ile beraber, yazarın kısa bir özgeçmiş ile iletişim adresleri de belirtilerek;
Ziman, C/o Duran
Albertstr. 2, 35576
Wetzlar/Almanya
adresine en geç 31 Temmuz 2006 tarihine kadar ulaştırılmaları gerekmektedir.

Juri Üyeleri: Ali Çiftçi, Nuh Ateş
Yusuf Yeşilöz

Yarışma ödülleri

1. ye 500 €
2. ye 300 €
3. ye 200 €

Yarışma sonuçları 30 Eylül 2006 tarihinde ilan edilecek. Ödüller daha sonra belirtilen yer ve tarihte bir törenle sahiplerine verilecek. Dereceye giren öyküler *Bîrnebûn* dergisinde yayınlanacak.

Nehemîn Festîvala Gelawêjê

Nehemîn Festîvala Gelawêjê di 20ê meha 11an de weke hertim li Silêmaniye dest pê kir. Festîval ji aliyê bingeha edebî û ronakbîrî Gelawêjê ve amade dibe. Di gotinên axêferên festîvalê de jî diyar dibû ku ev cara yekem bû ji bakurê Kurdistanê û ji Ewrûpayê mîvan besdar dibûn. (Malmîsanij, Fîrat Cewerî, Alî Çiftçî, Hesenê Metê, Rohat Alakom, Murad Ciwan ji Swêdê, Tosinê Reşîd ji Australiyayê, Azad Avci, Seyidxan Kurij ji Almanyayê, Abdullâh Keskîn, Deniz Gunduz û hinek kesen din ji Stenbolê besdar bûn.) Ji bilî mîvanen ku îsal ji Ewrûpayê û ji Bakurê Kurdistanê besdarî festîvala Gelawêjê bûn, çend weşanxaneyan jî bi pirtûkên xwe reng dan Festîvala Gelawêjê. Weşanxaneyâ Vate, Weşanxaneyâ Apec, Weşanxaneyâ Nûdem, Weşanxaneyâ Avesta, Weşanxaneyâ Komalê pirtûkên xwe li Pirtûkxaneyâ Gewre (Silêmaniye) bi gelek weşanxaneyen Faris, Ereb û kurdên Başûr re raxistin.

Di festivalê de gelek xelat ji bo şâîr û nivîskarên ciwan hatin belavkirin. Festîvalê heft rojan dom kir.

Di roja 27ê meha 11yê 2005an de jî **Bingeha Xakê** beşa çap û ragihandinê li Kitêbxaneyâ Silêmaniye zêrexelata *Pîremêrd* li sê nivîskarên kurd belav kir. Dezgeha Xakê ji sala 2001ê û vir ve, bi navê zêrexelata *Pîremêrd* her sal



Peykerê Pîremêrd li ber Kitêbxaneyâ Giştî li Silêmaniye

nivîskarekî kurd xelat dike. Xelata sala 2001ê Şêrko Bêkes û xelata sala 2002an ji Qale Mereyî wergirti bû. Ji ber hinek sedemên nehazirî, ev sê sal bûn zêrexelata Pêremêrd negêhîstibûn xwediyyêن xwe. Herweha ew xelatên salên mayî ji îsal hatin belav kirin. Dezgeha Bingeha Xakê, zêrexelata sala 2003an da Selîm Berekat, xelata 2004an da Şekroyê Xidayê Mihoyî û xelata sala 2005an ji da Malmîsanij.



Dimenek ji pêşengehê

Zwischen den Welten

Di nabêna cîhanan de

DOKUMENTARFILM



Güli Doğan

Di nabêna cîhanan de

Nivîskar û derhenêr Yusuf Yeşilöz, di Portraita xwe ya pirtebeq de integrasyona biserketî ya Güli Dogan'a ku bi temenê neh salî ji gundekî Kurdan yê li Tirkîyê koçeberî Swîsre dibe, rê dide.

Filmê wî **Di nabêna cîhanan de** (Zwischen den Welten) serpêhatiyên vê ji-na ku niha 35 salî ye, li cihê karê wê yê li daîreya Nufusê ya Winterthur, ji-yana wê ya rojane, ya bi keçen û mûrê wê, bi hevalên wê yên swîsrî re, serdانا wê ya ku bi nas û dostên bavê wê re, bi çand û adetên welatê xwe ve girê-dayîne, rê dide.

Bi saya şêweyê vekirî yê Güli Dogan bi aweyekî balkêş kevanê di navbera ji-yana wê ya niha li Swîsre û bêrîkirina wê ya bo gundê wê yî li ciyê tê hîs kîrin. Ew hewl dide ku zarokên xwe hînî çanda welatê xwe yê nû bike û hêvî dike ku ew di demeke dahatû de karibe riyekê ji bo adetên elewiyan rê veke.

Li gel dunyayên cihê film, çirokeke zewacê ya seyr jî eşkere dike.

Dünyalar Arasında

Yazar ve film yönetmeni Yusuf Yeşilöz, çok yönlü bu film portresi ile 9 yaşında bir Kürt köyünden İsviçre'ye göç etmiş Güli Doğan'ın başarılı uyumunu konu ediyor.

Dünyalar Arasında (Zwischen den Welten) adlı bu film, bugün 35 yaşında olan Güli Doğan'ı nüfus dairesinde yaptığı memurluk içinde, iki kızı ve eşi ile olan günlük yaşamında, İsviçre'li arkadaşları ile ilişkilerinde ve içinden geldikleri kültüre hala sıkı bağlı olan babasının dostları ile birlaklığını görüntüleyen.

Güli Doğan'ın açık ve samimi anlatımları ile film etkileyici bir şekilde bugünkü yaşamı ve özlemlerinin kaldığı köyü arasında gergin bir yay gibi bir bağ oluşturmuş. Kendi çocuklarına o kültürü tanıtmayı ve onları ileride Alevi gelenekleri ile tanıştırmayı arzu etmektedir. Film farklı dünyaların yanında, ayrıca emsalsiz bir evlilik hikayesini de anlatmaktadır.

Gundiyê Şerefliyê li Danîmarkê hatin ba hev

24ê meha 12an li Danîmark-Kopenha-
genê Gundiyê Şerefliyê bi şahiyeke
hatin ba hev. Gundiyê Şerefliyê yên
ku li Danîmarkê dijin, bi moreleke
bilind û coş besdarê şevê bûn.

Di şevê de Axaftinên komîta rêve-
bir û serokê SER-DERê şûn de Prog-
rameke kulturî hatibû amedekirin.
Koroya Zarakan (Kurikan), Nurettin
Çiçek û koma xwe, Şehrîbana Kurdî
bi muzikên xwe yên xweşik besdaran
kêfxweş kirin. Yıldız Gültekin ku bi
navê **Kewê** tê nasîn bi standup ên xwe
gundiyê Şerefliyê dan ken û girî.



Yaşar Atik xelatê dide Bekir Durukan.

Komîteya şevê, ji bo programê sur-
priz jî hazir kiribûn. Di kişandina loto
de hemû besdar ji bo xelatên mezin bi
dest bixin di nav heyecaneke mezin
de man.

Dawiya şevê, Komîteya rêveber, ji
bo xizmetkirina li gund spasiya Bekir
Çiftî, Suat Coşkun û Bekir Durukan
kirin û xelat hatin dayîn.



*Endamên komîteya karger ya gundê Şerefliyê
Bekir Çiftçi
Hüseyin Taşkıran
Doğan Durukan
Halil Atik
Şeref Yıldırım
Niyazi Öztürk
Meçit Coşkun*

Şeva Hesarê

Komela Gundê Hesarê ji bo endamên xwe şahiyek amede kir. Li Bajarê Kopenhagê di 25ê meha 12an de gundiyên Hesarê hatin ba hev. Cara yekemîn bu ku gundi li derveyî welat li Danîmarkê dihatin ba hev. Di nav gundiyên Hesarê de heyecaneke mezin hebû. Malbat bi jin û zarokan, bi pîr û kalan ve beşdar bûn.

Tê zanîn ku gundê Hesarê giredayê Kuluyê ye û ji ber koçberiyê gund wêran bûye. Di nav gundiyan de li gund xwedî derketin eleqetekê mezin heye. Hesariyên ku li Danîmarkê û yên ku li çend welatên din yên li Evropa dijîn bi hevudu ditinên hev pir kêfwxeş bûn. Nêzîkî 250 kesî hatibûn şevê. Ciwanan li ber kilamên kurdî govend girtin û şahiyê heta nîvê şevê dom kir.

Gundiyên Celikan-Yesilyurt li Swisre hatin ba hev

Di 25e meha 12an li bajare Züriche gundiyên li Evropa dijin bi amedekirina komela CAYVAKÊ hatin ba hev.

Ji Swissre, Almanya, Danemerke, Holland, Avusturya neziki 400 kes beşdari şevê bûn. Di şevêda Serokê Cayvakê kar û barê xwe yî sala 2005an bi raporekê pêşkeşî endamên xwe kir. Ji bo xizmetên li gund têن kîrin fikir û projên xwe anin ziman.

Di programa kulturî de sitranbêj û komên wan civan rakirin govendê. Bi taybeti stranbêjê aliyê me Osman Yilmaz stranê aliyê sitran.

Gundiyên Celika heta nivê şevê di atmosferêka germ da hevdu dîn û kefxweş bûn. Heta saleka din xatirê xwe ji hevdu xwestin.

Kongreya çaremîn a giştî ya Komela Ziman çêbû

Komela Ziman û Kultura Kurdên Anatoliya Navîn - bi kurtî ZIMAN di 29ê oktobra 2005an de li bajarê Wuppertalê yê Almanyayê kongra xwe ya 4 a çêkir.

Bi bejdariya piraniya endaman û mîvanên ji Weqfa Swêdê civînê dest pê kir. Di kongrê de rapora Komîta Rêvebirinê hat xwendin. Serokê komelê di rapora xwe de li ser karêna sala derbasbuyî rawestî. Paşê ji rapora Komîta Çawdêr hat xwendin. Li gor rapora çawdêran hat xuya kîrin ku komelê di sala debasbûyî de xebatên xwe li go destura xwe meşandiye û herwiha repora aborî ji bi rêk û pêk bû. Kongrê komîta karger ya sala çûyîn rûspî kir. Piştî rûspîkirinê ji bo sala nû, ji piraniya endamên Komîta Karger ya sala derbasbûyî Komîta Karger ya nû hat hilbijartin.

Dîwan ji aliyê Mahmut Baran, Raşîd Karakaya û Îhsan Türkmen ve hat maşandin. Piştî gotar, daxwaz û pêşniyazan dîwanê ji bo komîta nû serkeftin hêvî kir û kongre bi dawî anî.

Bi serokê komela Şerefliyê SER-DERê, Doğan Durukan re hevpeyvînek

*Birêz Dogan Durukan ji bo
xwendevanên me bi kurtayî kerem
ke xwe bide nasîn.*

– Birêz Muzaffer, ez ji bo dabûna we ya vê fersendê spas dikim. Ez di sala 1960an de, li gundê Şerefliyê ji dayik bûme. Dawiya sala 1972an hatim Danîmarkê ba bavê xwe. Heta demeke min kar kir, deh sal in ku restoranta min heye. Zewicî me û 4 zarokên min hene.

*Birêz Durukan, di destpêkê de gundê
xwe bide nasîn û ji bo komela we tu
dikanî bi kurtayî ci bêjî?*

– Gundê me Şereflî girêdayî Konya-Kulu ye. 37 km. dûrî qezeyê ye. Berê gundê me girêdayî Haymanayê bû. Di sala 1972an de derbasî Kuluyê bû. Eşireta me Reşî ye, em Nasirî ne. Ji gundê me koçberiyeke mezin çêbû. Li bajarêن Tirkiyê û dewletên Ewropî bi cih bûne. Di salêن dawiyê de gundiyêن me vedigerin gundê xwe. Însanên me

yêن li Ewropa xaniyêن pir modern li gund çê dikin û gund şûn ve ava dikin.

Komela me SER-DERê di sala 2003an de bi destpêka komeka bi însiyatîv li vir hat damezrandin. Komela me di demeke bi nêzîk de xwe organîze kir û li welatên Ewrupa gundiyêن me kişand nav kar û bar. Endamên me li Swîsra, Almanya, Danîmark, Norvej û Swêdê hene. Me bi alikariya teknîkê di demeke kurt de têkilîyêن xwe bi endemên xwe re danî.

Çima navê komela we ne bi kurdî ye?

– Di destpêka vî karî de li Tirkîyê jî avakirina komelê di fîkrê me de hebû. Hûn jî dizanin li Tirkîye ji bo ziman û kultura kurdî zordarî û qedexekirin hene. Ji bo avakirina komela me li Tirkîyê me nav bi tirkî lêkir. Bi xwe, navê gundê me Şereflî ye. Dernek yanî komele jî bi zimanê tirkî me daye. Bawer dikim va mesela girêdayiyê û heqan û heqan e.



Serokê komela Şerefliyê, SER-DERê birêz Doğan Durukan

*Di nav gundîyên we de fîkrê komel
avakirinê çawa hate holê?*

– Ez dikanim bêjim, em dibin tesîra faaliyeten sosyalî û hunerî yên li aliyê me de man. Bi taybetî ji destpêka kovera Bîrnebûnê di nav civaka Anatoliye Navîn de roleke mezin lîst. Civaka me ya Anatoliya Navîn ji aliyê sosyalî, kulturî û aborî de tesîreke mezin dît. Ev kar û barêن me berdevam e. Gundên me yên din jî organîze dibin û rêxistinên xwe ava dikin. Gundiyên me ji bo xwedîderketina li gund û insanên xwe yên ku li wir dijîn xizmeteke bikin, dikevin pêşbirikê. Tiştên têne

holê tiştên baş in. Me dereng dest pê kir. Meriv nikane ji wan dûrkeve.

*Heta niha we çi kar kir û di pêşerojê
de hûn dixwazin çi bikin?*

– Ji bo têkiliyên xurt di nav endam û gundiyên me de hebin, me malperek www.serefli.com hazir kir. Em, komita rêvebir bawer dikin ku hewcedariya me bi perwerdê heye. Ji bo wê, me li gund dibistan nû kir, qonexek ava kir. Ji bo qonaxa gund computer kirîn. Pirtûkxane amede kir, niha nêzîkî 400 pirtûkên me hene. Di pêşeroja me de heşînkirin û xweşkirina gund heye. Em ê di destpêka biharê de dest pê

bikin daran li gund daynin. Pirsa çop, av û wekî din di projeyên me de hene. Çend roj berê me şeva hevudû dîtina gundiyyêne me ya duyemîn amade kir. Li wir têkiliyyêne germ çêdibin, hesret û dert têne betalkirin. Salê carek be jî em dixwazin hersal şevek amade bikin.

*Birez Dogan, kurdên Anatoliya
Navin li welatê Danîmarkê pir zêde
ne, gundêne din jî komelêne xwe hene?
Hûn nikanin bi hev re kar bikin, ji
bo zarokêne xwe, heqêne xwe, ziman û
kultura xwe kar bikin?*

– Bi rasti em li vir kêmasiyyêne komel û rêxistinêne koçberan dijin. Ji bo wan kêmasiyyêne me, siyasiyyêne Danîmarkî firsenda dibînin û heqêne me biçûk û betal dikin. Em û çend gundêne me yên ji Anatoliya Navîn yên ku komeleñ xwe avakirine hene. Armanca me li vir federasyona komeleyan avakirin bû. Di hazırlî û têkiliyyêne me de, me fahm kir ku hem komele û hem gundiî hîn ne hazir in. Di pêşerojê de ew jî hazir bin, em dikanin yekîtiyeke çêkin. Em dikanin bi yekîtiya xwe li vir bi zêdebûna endamêne xwe ji partiya sosyal demokrat a Danîmarkî şûnda hêza duyemîn ava bikin.

*Ji bo komela we piştgiriya insanêne
gund we hûn çava dibinîn?*

– Di nav gundiyyêne me de piştgiriyeke mezin heye. Ji bo civinêne me yên

endam û civîna kongrê eleqe zêde heye. Ji bo endametiyê, alikariyê û karûbarêne gund gundiyyêne me ji bo xizmetan dikevin rêzê.

*Di civîn û şahîyêne komelê de bi
kîjan zimanî tê dengkirin?*

– Em bi zimanê kurdî û tirkî dengdîkin. Di nav kurmanciya me ya Anatoliya Navîn de gotinêne tirkî pir zêde hene. Ji bo wê hevalêne me car caran bi tirkî deng dikin. Lê belê kurmançî jî tim dikeve navbera dengkirina tirkî, çunkî zimanê dayika me ye.

*Li Kopenhage însanê Şereflîyê pir in.
Hûn nikarin kursêne zimanê dayîke
-kurdî ji bo însanêne xwe bi taybetî jî
ji bo zarokêne xwe organîze bikin, li
wî welatî alikarî jî tê dayîn an na?*

– Di civaka ku em tê de dijin ji bo heq û azadiyyêne mirovan pir dewlemend e. Îmkan û şert hene. Ew girêdayiyê daxwaza me ye. Gerek em ji bo wan meselan kar bikin.

*Di dawiyê de tu dixwazi çi bêjî,
mesajek te heye?*

– Ez carek din ji bo xwenasendina xwe û gundiî xwe ku we firset da min, ez spas dikim. Kovera Birnebûnê ji bo kurdên Anatoliya Navîn divê herdem bijî. Ji bo ku di pêşerojê de karûbarêne xwe bi awayekî zanistî bi pêşta bibe, pêwîst e ku em hemû piştgiriya wê bikin, spas!

Bi radyoya Zayele re hevpeyivek

Zayele ku maneya wê "dengvedan" e, besa kurdî ya Radyoya Navneteweyî ya Swêdê ye û programa xwe ya pêşiyê di 6-ê kanûna paşiyê sala 2001ê de weşand. Weşanên Zayele ji roja 16 çile 2006 ve bûye rojane.

Hûn dikarin radyoya xwe bi xwendevanên me bidin nasandin! Wek nimûne, navê radyoya we çi ye? Radyoya we bi serê xwe ye yan di nav radyoya dewleta Swêde de beşek e?

– Zayele navê weşanên kurdî ya li radyoya Swêdê, (Sveriges Radio) ye. Gotina "zayele" tê wateya dengvedanê, bi swêdî "eko".

Di weşanên Zayele de bûyerên girîng yêni li civaka Swêdê ciheke berfereh digrin. Herwekî din, rewşa kurdên li Swêdê ya civakî, çandî û siyasî xwedî cihekî din ê bingehîn e. Bûyerên li Kurdistan û cîhanê yêni ku kurdên li Swêdê eleqeder dîkin jî di weşanên Zayele de cih digrin.

Weşanên Zayele li ser erkên xizmeta civakî (Public Service) têne amadekirin. Yêni ku ev wezîfe dane Radyoya Swêdê parlamento û hukumeta Swêdê ne. Radyoyeke serbixwe û bê alî ye. Mirov herweha nikare ji radyoya Swêdê re bibêje "radyoya dewletê".

Zayele xebat û nirxandina xwe bi helwesteke profesyonel, bi awayekî serbixwe û li ser bingehê rojnamevan-tyê dike. Tu partiyek siyasî, rôxistinek xwedî berjewendî, şirîket an jî hêzek nikare li ser hilbijartina mijarêne me an jî

awayêni weşanên me bandora xwe bike an jî xwedî gotin be. Parastina zimanê kurdî yek ji erkên me yên bingehîn e.

Belê, radyo ji aliyê kîjan dezgehî ve tê fînanse kirin?

– Dezgeha ku weşanên bi kurdî (Zayele) fînanse dike, radyoya Swêdê ye ku ew bi xwe bi alîkariya lisansan (licens-avgift till Radiotjänsten) tê fînanskirin. Her malbatex xwedî televizyon an radyo li Swêdê salê 1920 kr (2005) ji bo lisansê pere dide. Bi vî awayî Radiotjänst salê 6 milyar kron pare berhev dike û ji van 37% didin radyoya Swêdê. Bi kurtî radyo, ne ji aliyê dewletê ve, yekser ji aliyê guhdaran ve tê fînansekirin

Zayele ji kengî ve weşan dike? Kîjan roj û rojê çend saetan weşan dike? Gelo kad û frenkansa radyoya we çi ne? Bi tenê li Swêdê tê guhdarî kirin an li welatên din jî mirov dikare guhdarî bike?

– Weşana yekem a Zayele di çilê 2001 ê destpêkir û her hefte sê car bi giştî 60 deqîqe bernameyên cuda diweşandin.

Weşanên Zayele, besa kurdî ya Radyoya Swêdê, ji roja 16ê çileyê 2006an ve bû rojane. Her êvarêne nava hefteyê



Amadekar û berhemhênerên Zayele; Şukran Kavak, Zana Serin, Şîlan Diljen û Nasser Sina

di navbera saet 17:20 – 17:40 de mirov dikare li ser pêla **FM 89.6 khz** li Stockholmê û li ser pêla **P2** li herêmên din ên Swêdê guhdariya weşanên Zayele bike. Weşanên êvarê her şev di navbera saet 22:00 – 22:20 de li ser heman pêlî têne dubarekiran. Rojên şemîyan jî pişt nîvro di navbera saet 13:30 – 14:00 de bernameyek me heye ku bûyerên girîng yên hefteyê û mijarên taybetî diweşine. Bernameya şemiyê roja yekşemê li Stockholmê di navbera saet 11:30 – 12:00 tê dubarekiran. Ev bernâme herweha rojên şemî û yekşemê di navbera saet 18:00:18:30 (CET) de li ser pêla kurt 41 metre 7420 khz li derveyê welat tê belavkirin. Agahiyên berfereh yên li ser bernâmeyên Zayele, dem û pêlên

weşanên wê di malpera Zayele de cih digrin. Malper bi kurmancî û soranî tê amadekirin û her roj tê nûjenkirin. Mirov dikare bi rêya malperê guhdariya weşanên rojane û bernâmeyên taybetî bike. Adresa me ev e:

http://www.sr.se/rs/red/ind_kur.html

Hûn beşa kurdî bi kîjan zaravayên kurdî dîkin? Ji bo her zaravayî çend kes kar dîkin.

– Beşa kurdî bi zaravayên kurmancî û soranî weşan dike. Di beşa kurdî de çar kes kar dîkin; sê kurmancû yek soran. Lê, ên kurmanc jî soranî fêm dîkin û bi vî zaravayî bernâme çêdîkin û yê soran jî bi kurmancî jî dizane û bi vî zaravayî bernâme çêdike. Ji ber vê yekê di warê

temsîla van her dû zaravayan de hetanî niha tu pirsgirêk derneketine. Lê, kêmâsî di warê zaravayên dimilî (zakî), hewramî, feylî û loranî de heye. Ji bo derxistina pêş a van zaravayan jî lêgerînên me dê di vê dema nû de xurtir bibe.

Radyoya we xwedîyê weşaneke çawa ye? Yanî hûn nûçeyan didin, hevpey-vînan dîkin, muzîkê dîkin?

– Zayele, nûçeyên rojane naweşîne. Berpirsiyarên radyoya Swêdê ev biryar dane. Lê Zayele bûyerên mezin ên di rojevê de lêkolîn dike û bi kurahî digihîne guhdarên xwe. Prensipa bingehîn a nûçe û bernameyên aktuell ew e ku divêt eleqederiya van bi kurdên Swêdê re hebe an jî bandoreke li ser rewşa kurdên Swêdê bike.

Wekî din, Zayele rewşa kurdên li Swêdê û bûyerên ku eleqederiya xwe bi kurdên li Swêdê re hene ji nêzîk ve dişopîne û bi awayên (formatên) bernameyên aktuel, magazîn û çandî digihîjîne guhdaran.

Zayale radyoyeke cuda û taybetî ye. Li Swêdê gelek radyoyên herêmî hene, radyoyeke muzîkê ye. Lê bûyerên çandî yên kurdî, swêdî û navnetewî ji nêzîk ve dişopîne. Bi gelek hunermend, stran-bêj û muzîkvanên kurdan re hevpeyvîn çêdike û wan bi tevî muzîk û stranan diwesîne.

Hevpeyvîn, roportaj û dokumen-terên radyoyî jî çend ji wan rîbazên radyoyê yên bingehîn in ku em bi kar

tînin. Armanc ew e ku bi rengekî profesyonel bernameyên bi kalîte bigihîjinin guhdaran.

Gelo daxwazeke we ji guhdarê kurd heye?

– Ji bo meşandina weşanek baş her radyoyek pêdivî bi danûstendinê guhdarê xwe re heye. Em hêvîdar in ku guhdar bi awayekî aktîv li weşanên me guhdar bikin, nêrîn, rexne û pêşniyazên xwe ji me re bi rê bikin. Herweha gelek girîng e ku guhdarê me di derbarê bûyer, çalakî û pirsgirêkên xwe de, me agahdar bikin û ji bo çêbûna bernameyên li ser pirsên cuda pêşniyazên xwe pêşkêş bikin.

Spas ji bo agahdariya we!

Her êvarêن nava hefteyê di navbera saet 17:20 – 17:40 de mirov dikare li ser pêla FM 89.6 li Stockholmê û li ser pêla P2 li herêmên din ên Swêdê guhdariya weşanên Zayele bike.

Ev bername herwuha rojên şemî û yekşemî di navbera saet **18:00- 18:30 (CET)** de li ser pêla kin **41 metre 7420 khz** li derveyê welat tê belavkirin:

Saet 19:00an li Turkiye

Saet 19:00an li Sûriye

Saet 20:00an li Kurdistana başûr

(Îraqê)

Saet 20:30an li Îranê

Kurdistan, durûtiya dezgehêñ navnetewî û em

Nifûsa 168 dewletan ji ya Kurdan kêmtiler e

Gelê kurd di nav rojêñ girîng de derbas dibe. Kevir û berdêñ ku dorberê Kurdistanê girtibûn û Kurdistan kiribûn zindan, ev çend sal in ku li parçeyekî ji cihê xwe liviyan. Îdî kes nikare kevir û berdêñ ku ji cihê xwe liviyane, dîwarê ku rûxaye, rast bike û têxe şûna xwe ya berê.

Dîroka gelê kurd, di destpêka sedsala 21an de niha li başûrê Kurdistanê tê nivîsandin. Dijminên gelê me, neyarêñ gelê kurd hewl didin, dicivin, li berxwedidin ku çerxa dîrokê bi şûn de biggerînin. Ev hewl, ev berxwedanêñ dijminên gelê me êdî bê fêyde ne.

Ji Mahabad û Kermansah heta Sêwas û Rihayê, ji Agirî û Dêrsim heta Qamişlo û Barzanê, ji Xaniqîn û Silêmanî heta Amed û Gencê, Kurdistan ev 200 sal in ku bi seranser hat wêran kirin. Kurd bi sedhezaran şehid dan, bi mîlyonan însanêñ me ji warêñ bav û kalan hatin dûrxistin. Bi sedhezaran, bi mîlyonan zarok (mindal) sêwî man,

bi sedhezaran dayîkêñ me reş girêdan û şîn girtin. Qewlêñ bi dehhezeran keç û xortêñ kurd ne gîhîştin cih.

Lê ewqas êş û azar, cefa û êşkence vala neçûn. Ala kurd û Kurdistanê niha li seranserê başûrê Kurdistanê li her derê, ji parlamentoyê heta parêzgehêñ bajaran, ji nehiyan heta gundan li dar e.

Pêwîst e gelê kurd bi tevayî spasdariya xwe bo Kek Mesud Barzanî, bo Mam Celal Talabanî, bo her du hukumetên Kurdistanê, bo pêşmergeyêñ dilsoz û qehreman û bo bi deh hezeran şehîdên Kurdistanê nîşan bidin. Pêwîst e hemû kurd bi hev re ev destkeftiyêñ dîrokî wek çavêñ xwe biparêzin û nehêlin ku neyar destêñ xwe dirêjî wan bikin.

Kurdistan dewletek e

Sed sal berê dijmînen kurdan, ji kurdan jîrtir bûn, kurd ne li ser hev bûn, belav û sist bûn. Li ser de jî dewletên mezin wek Britanya û Fransa aliyê dagîrkeran girtin û dewletên peyk, wek Irak û Suriye avakırın. Ji ber wan sedeman

kurdan winda kirin û Kurdistan bû çar
bes, çar perçê.

Niha sed sal bi şun de, du ji dij-
minên Kurdan, Saddam bi dagîrkirina
Kuweytê û karbidestên tirk jî bi rê-
girtina hêzên Amerikî şâsiyeke gelek
mezin kirin. Ji ber şâsiyên Saddam û
tirkan kurd bi qezenc derketin.

„Yan Kurdistan, yan Neman“ bû
şiar, nîşan û parolaya kurdên Başûr. Di
destpêka salên 90î de kurd, di nav çê-
perên dijminan de pencereyek vekirin;
deng û hawara xwe gihadin cîhanê.
Îro, deh-panzdeh sal bi şun de cîranên
kurdan êdî ne tenê rejîmên dagîrker û
neyar in, her ûsa Amerika û raya giştî
ya cîhanê ye jî.

Kurd êdî ji vir bi şûn ve ne mecbûr in
ku li payîtextên karbidestan, li Enquerê,
li Tehran û Şamê meqerên xwe vekin,
bona ku ji cudayetiya dijminan sûd û
fêde bigirin û rîyek bo derve vekin.
Ev guhertinên dawî rê didin kurdan
ku têkiliyên xwe di nav xwe de baştir
bikin û dijayetiya hevûdu nekin.

Kek Mesud Barzanî û Mam Celal
Talabanî hemû plan û dekûdolabêñ
neyaran pûç kirin û di dîroka Kur-
distanê ji niha de cîhêñ xwe yên pîroz
girtin. Alians û yekgirtina hilbijartîn
û referandûmê, civînêñ serkidayetiya
her du partîyan, civînêñ parlamenta
yekgirtî, bîryara hukumeteka hevbeş,
bîryar û kiryarêñ pîroz in. Pêwîst e her
kurdek piştgiriya vê prosesê bike.

Kurdistana Başûr, bi parlamento û
hukumet, bi sistêma aborî, dadî û idarî,
bi dezgehên asayış, bi polîs û leşger, bi
sistêma perwerdekirin û tendûristiyê
kî ci dibêje bila bibêje, bi xwe de facto
dewletek e, dewleteke bê ïlan kirî ye.

Ger Efganistan, Tirkmenistan û Oz-
bekistan; ger Gurcistan û Azerbeycan;
ger Kongo, Ruanda û Nijerya; ger
Filipîn, Malezya û Endonezya dewlet
in, Kurdistana me, Kurdistana Başûr ji
wan ne këmtir e, ji wan dewlettir e.

Xetêñ sor“ yên dewleta Tirk pûç bûn

Siyaseta dewleta Tirk li beramberî
kurdan pûç bû. Tirkîyê, bona ku kurd
jê sûdê negirin, riya hêzên Amerikî
girt û nehîst ku ev derbasî Kurdistana
Başûr bin. Ev jî bo kurdan baş bû. Ev
cara yekem bû ku tirk şâsiyeke baş û bi
qezenza kurdan dikin. Ev şâsiya tirkan
bo gelê kurd pîroz be û xwedê tirkan
bê şâsiyên welê nehelê!

Tirk bi tevayî, bê problem, bê dudilî
piştgiriya Filistin, Çeçenistan, Arnavu-
tên Kosova dikin, bi dilûcan dewlet-
bûna wan dixwazin. Lê dema ku dor
tê kurdan hemû bi hev re, ci kemalist
û sosyalist, ci islamî û laik, dijî kurdan
dibin yek, dibin şovenîst, nîjadperest
û rasistên bê numûne. Ev ne tenê dijî
daxwazêñ gelê me yê bakûr derdi-
kevin, her ûsa dijî daxwazêñ kurdên
Kurdistana Başûr jî derdi kevin, dev
davêjin wan jî. Hemû bi yekgirtî dibêjin
mafê kurdan nîn e ku, dewletek avabi-

kin; mafê kurdan tune ku bi awayekî federalî di nav Iraqek demokratik û pirdengî de bijîn. Gora raya wan tenê rîyek pêş kurdan heye: Ev jî nîrê koletî ye, ci yê ereb, ci yê faris û tirkan.

Derbarê kurdan de termînolojiya mîlîtarîst û kemalist, îslamîst û sosyalîstên tirkan ji hevûdu ne gelek cuda ne. Ferqa wan tenê di nuansan de ye, di fiiliyat û pratikê da ferqeke mezin nîn e.

Tirkênu ku heta berî çend mehan qala „xetêن sor“ dikirin û damezrandina dewleteke kurd Iraqek federalî, Kerkûk û berjewendiyêن Tirkmenan li hemberî kurdan wek sedemên şer û dagîkirina Kurdistana Başûr bi nav dikirin, niha qet qala „xetêن sor“ nakin. Ev jî nîşan dide ku „xetêن sor“ ya dewleta Tirk li hember kurdan pûç bûn, ji ber ku kurdan siyaseteke baş meşandin.

Turkiye, İran û Suriyê mecbûr in siyasetên xwe yên qirêj li hemberî kurdan biguhêrin. Yen ku naxwazin xwe bighêrin, têن gûhertin. Ji ber ku dem û wext hatin guhertin, ji ber ku dinya û cihan êdî ne ya berê ye.

Dem û dinya hatin guhertin

Bi rûxandina dîwarên Berlinê ne tenê şerê sar çû û sîstema sosyalîst hilweşîya. Her úsa nexşeya(xerîta) siyâsi ya cihanê jî hat guhertin.

Kî dikarîbû 15-20 sal berê texmînbikira ku li Ewropayê dora 10 dewletên nû wê bêñ avakirin?

Kî dikarîbû 15-20 sal berê texmînbikira ku reşik li Efrîka Başûr wê bibin desthilatdar û Tîmora Rojhilat azad be?

Kî dikarîbû 15-20 sal berê texmînbikira ku têkoşinên çekdar li İrlanda, li Aceh û Endoneziya dema xwe tijî bikin û reyên aştiyane vebin?

Ü kî dikarîbû 15-20 sal berê bigota ku riya serxwebûna Filistînê dê vebe?

Ev hemû guhertinên dawî jî nîşan didin ku dinyaya me, dinyaya îro, ne ya do ye, dem, pîvan û nêrîn hatine guhertin.

Lê Kurdistan hîn jî sêwî ye

Dema mirov li nexşeya siyâsi ya cihanê binêre, dibîne ku îro dora 200 dewletên serbixwe hene. Ger mirov hêjmara Kurdan wek 35 mîlyon berbiçav bigre, dibîne ku ji wan 200 devletan ku nifûsa wan, nîşteciyêن wan ji ya Kurdan zê-detirin, tenê 32 dewlet in. Nifûsa 168 dewletan, ji ya Kurdan kêmîtir in. Ji wan 200 dewletên ku niha endamên UN, netewêن yekbûyi ne, 37 dewlet nifûsa wan ji 1 mîlyonî kêmîtir in.

Kî van dewletan nas dike? Sao Tome û Prinsip, Seyselen, Antigua û Barbuda, Aruba, Bahamas, Barbados, Belize, Dominica, Grenada, Antilyaya Hollanda, St. Kitts û Nevis, St. Lucia, St. Vincent, Virgin Island, Andora, Kanalinsel, Grönland, Samoya Amerika, Polonezyayê Fransa, Guama Amerika, Kiribati, Marshallinsel, Mikronesien,

Neuekaledonien, Palau, Samoa, Tonga û Vanuatu.

Nifûsa van dewletan ji 200.000 kêmîtir e. Her yek ji van 28 dewletan, qasî Zaxo nakin lê ew wek dewletên serbixwe û soverên têr nas kirin û 35 mîlyon kurd ji vî mafî bêpar in? Ma ev adalet e?

Ger mirov wek pîvan, wek kriter mezinbûna welat û erdê bigire jî, tabloyek wek ya jorîn dibîne. Erda kurdan ji 500.000 kilometrekare (km²) mezintir e. Ji van 200 dewlatan, tenê erdê 22an ji Kurdistanê mezintir in. Bi gotinek din 180 dewletên cihanê ji Kurdistanê biçûktir in.

Ger kriter û pîvan dewlemendiya binerd û sererd be, ji Kurdistanê dewlementir çend welat hene? Ma Kurdistan ne deryaya ava şîrîn û petrolê ye?

Kurd li ser erdê xwe, li ser warê bavûkalên xwe dijîn. Teritoruma wan li ser hev e, yekgirtî ye, ne belav belav e. Zimanekî kurdan heye û ev jî ji yê rejimên koledar cuda ye. Navbera kurdan de ji ali çand û kulturî de, ji alî dîrokî de pêwendî û bingehêن xurtirîn hene.

Dema ku qala kurdan dibe, hinek dibêjin, mesele gelek girift e, tevlî hev e û dema avakirina dewletên netewî bihûriye. Ev hêz û kes rastiyê vedişerîn, bin cil dikan.

Rast e, di sedsala bûhuri de, sedsala 20an de, bi dehan dewletên netewî sazbûn û ev proses bi gelempêrî temam bû. Lê hin gel hene ku têkoşina wan hîn jî berdewam in. Ji van gelan yek ji kurd in.

Ger dema dewletên netewî derbas-buyî be, ev dewletên ku ev deh sal in li Ewropayê avabûne ci ne?

Hirvatistan, Slovenya, Bosna û Hersek, Estonya, Litvanya, Letonya, Slovekyâ kengî û li ku ava bûn?

Riya devletbûna Filistînê, kengî vebû? Timora Rojhilat ne li vê dînyayê ye? Riya dewletbûna Albanê, Arnavutên Kosova, Kîjan hêz vedikin? Ma ev ne dezgehêن wek UN, NATO, OSZE (AGİT), Konseya Ewropa û Yekitiya Ewropa (EU) ne?

“Kes nikare gelekî, xelkekî di nav rejimeke zordar de bigire”

Mirov qebûl bike an neke, îro Irak 3 beş e, ev fakt û rastiyeğe. Kurd ne ereb in û ereb jî ne wek hev in, di nav şîî û sunniyan de bi sedan sal in problem û pirsgirekên mezin hene.

Kurd bi dilsozî piştgiriya Irakeke Federal dikan û hemû hêza xwe bo vê armancê pêşkeş û amade dikan. Di hilbijartina meha yekê de, di referandumu meha dehan (2005) de bi hemû hêza xwe beşdar bûn.

Di 80 saliya dewleta Irakê de cara pêşîn hilbijartineke demokratik û adil pêk hat û kurd 77 parlamenteş şandin

parlamenta hevbeş ya Bexdayê û kurdek, birêz Mam Celal Talabanî bû serokê Komara Irak a Federal. Û kurd di nav hukumeta hevbeş de bi xurtî cih digirin.

Ne îro, lê sibê ku bû û şerek di navbera suni û şîyên ereb derkeve û Irak bibe gola xwînê, pêwîst e kurd çi bikin?

Ne îro, lê sibê, aliyek ji ereban an jî bi tevayî bêjin, em Irakeke Federal naxwazin û dest bavêjin destkeftiyêñ kurdan, pêwîst e helwesta kurdan çi be û ji kurdan çi tê xwestin?

Dema ku serokê Kurdistanê birêz Mesud Barzanî dibêje, "em ê heta dawiyê xwe biparêzin", bê heq e?

Gotina seffîrê berê ya Amerika li Hirvatistanê, Peter W. Galbraith ku li piş hilbijartina meha yekan û referanduma ku li Kurdistanê pêk hat û ji sedî 98% kurd bo serxwebûna Kurdistanê deng dan, gotiye ne rast e? Galbraith dibêje; "Dersêñ ku Amerika ji Yugoslavyayê wergirtiye ev e: Kes nikare gelekî, xelkekî di nav rejîmeke zordar de bigire".

Piraniya dewletên Ewropî li dijî avakirina dewleteke kurd derdikevin. Ma dikarin ew bêjin, dema sibê erişek li ser Kurdistana azad destpêbike tewr û helwesta wan dê çi dibe? Kurd çi bikin? Stûyê xwe dirêjî celadan bikin?

Ev dewletên mezin yên Ewropa, ev dezgehêñ navnetewî ku dibêjin em li ser hîmîn demokrasî û mafêñ mirovî

pêk hatine, dema Saddamê xwînxwar bi êrişekî 182.000 Kurdên Barzan birin û kuştin, qet dengê wan derket? An ji dema Kurd wek li Halebçe bi hezaran bi gazêñ kimyevî hatin kuştin, ci kirin?

Ev hêzêñ mezin, ev dezgehêñ navnetewî ku li beramberî kuştina sedhezaran kurd, wêrankirina tevayîya Kurdistanê dengê xwe dernexistine, ma heqê wan heye li ser pêşeroja Kordan gotinek bêjin? Ji %98 ên kurdan serxwebûnê dixwazin û deng didin, maneya vê, giraniya vê qet nîne?

Bo van sedeman ji kurd dibêjin "garantiya jiyana me, em bi xwe ne". Ev jî, rê û imkanêñ hevbeş a demokratik li Irakê nebe, ji derî dewleteke serbixwe riyeke din tune û namîne. Wek her netewe, heqê kurdan jî heye ku keştiya xwe bikşînin bendereke aram.

Yekîtiya Ewropa û kurd

Belê, dinya hat guhertin lê pîvan, kriter û standartên wê ji bo kurdan yên berê ne, ji dema şerê sar mane û hîn nehatine guhertin. Bona vê jî, yên ku pêwîst e xwe biguhêrin ne kurd in, yên ku ji kurdan jiyanekê di bin nîrê koledariyê de dixwazin, in. Divê ew xwe biguherin.

Yekitiya Ewropa (YE),

- ku bo aştiya Endonezya û Aceh bi sedan pispor û imkanêñ mezin pêşkêş dike,

• ku piştgiriya dewleta Filistin dike û her sal bi sedan mîlyonan Euro li alîyê teknîkî, personalî û aborî alîka-riya hukumeta Filistînê dike,

• ku bo parastina Albanê Kosova, leşger û timên taybet rîdike û riya serxwebûna Kosovayê vedike, dikare, bo parastina Kurdistanê jî roleke biçûk bigre ser milên xwe.

Yekîtiya Ewropa dikare, bo avakirina dezgeheke parastinê wek OSZE (AGİT) li Rojhilata Navîn dest bi kar bike, ji ber ku Rojhilata Navîn goristana kêmnetewe û gelên bindest e, ji ber ku wek mînak mesela kurd çar dewletan alakadar dike, ji ber ku îstîqrara herêmê bi demokratîsekirina dewletên Rojhilata Navîn û çareseriya pirsên gelên bindest derbas dibe û hwd.

Yekîtiya Ewropa dikare, bo avakirina dezgeheke abori û siyasî ya heremê û navdewletî dest bi kar bike. Ereb, faris, tirk û kurd dikarin bi hev re proseseke nûjen û modern destpêbikin.

YE dikare li Hewlêrê Buroyek, Oficek veke û bo xurtkirina civaka sîvîl, bo piştgiriya dezgeh û rîexistinê sîvîl dest bi xebatê bike. Her ûsa emdamên Yekîtiya Ewropa dikarin balyozxane û konsolosxaneyên xwe li Hewlêrê vekin.

YE dikare bi riya konferans û sempozyuman modela YE ku li ser hîmîn federalî pêk tê, hêzên heremê ronî û agahdar bike.

YE dikare şirket û firmeyên Ewropî bo berjewendiyên xwe teşwîqê heremê bike, daku ji alîyê aborî de pêwendî destpêbikin.

Û cîhan, dezgehê navtenewî ku li ser kuştina Refik Hariri, koşka Beşar Esad dilerizînin, nikarin çavêن xwe li hemberî têkoşîna tibetiyân, çeçenan û kurdan bigirin.

Mafê her neteweyî heye ku di nav bexçeyê xwe de bijî

Min ev nûmûneyên jorîn, ev mûqeşeya mesela kurd û yên din bo ku armanc baş bê fêmkirin da. Ez, wek şexs ne li dijî dewletên biçûk im ku mîn navê wan dan. Mafê her neteweyî heye ku di nav bexçeyê xwe de, li gora dilê xwe bijî. Dîsa, ez ne li dijî alikariya hêzên navnetewî bo çareserkirina hinek pirsên netewî me ku iro li Filistîn, li Aceh, li Kosovayê têr meşandin. Lê ez li dijî pîvan, kriter û standartên dualî me û dibêjim ev durûtî ye. Pêwîst e li qada navnetewî pîvan û standart yek bin.

Rêberên gelê Kurd, Birêz Mesud Barzanî û Birêz Celal Talabanî gelek caran diyar kirin ku kurd, di nav Irakeke demokratik û federal de dixwazin bijîn. Lê dema ku riyek ûsa bê girtin, bernameyek, programek hêzên navnetewî heye ku kurdan li hemberî êrişan biparêzin? Wexta ku kurd li bexçeyê xwe, xwe dijî êrişkeran biparêzin, sûcdar dibin?

Erkên kurdên Ewropayê

Îro li Ewropayê mîlyonek heta mîlyon-û nîvek kurd dijîn. Bi sedan, bi hezaran însanên me yên têgîhiştî hene. Lê dîsa jî, piştgiriya Kurdistana Başûr gelek sist e. Di nav kurdan de, di nav gelên Ewropî de bêdengiyeke mezin heye û mesela Irakê îro jî, sibê jî naqede û çareser nabe. Û piştgiriya Kurdistanê tenê bi daxuyaniyê internetê jî nagêhêje armanca xwe. Pêwîst e ku li her welatê Ewropayê komîteyên piştgiriya Kurdistanê bênen sazkirin û lobî û gihadina raya gelemerpî bi xurtî bê meşandin.


Dema ku komîte û dezgehêne me hebin û di nav de dostêni Ewropî, ci

siyasetmedar, ji rojnamevan û ci pispor, cih bigrin, dikarin tesîreke baş li ser hukumetê wan dewletan bikin. Ji ber ku em hemû jî dizanin wijdana dewletan nîn e, dewlet di riya berjewendiyê xwe de dimeşin. Lê mirov dikare bandorê li ser wan bike.

Dîsa pewîst e ku hukumeta Kurdistanê, ji her dewletê Ewropa heyetênu ku ji siyasetmedar, rojnemevan, pispor û ji dostêni kurdan pêk tê, dawetê Kurdistanê bike, daku ew Kurdistanê baş nas bikin û bo lobiya Kurdistanê bikaribin bixebeitin.

November 2005

Ansîklopediya Zarokan



Hûn dikarin vê ansîklopediya Zarokan ji adresêni jêr bi dest bixin

DİPNOT KİTABEVİ

Selanik Caddesi No: 82 / 32

Kızılay ANKARA

Tel: 312 - 419 29 32

Li Swêdê

Apec

Box 8121

163 08 Spånga, Sweden

E-post: apec.t@telia.com

Kovara Bîrnebûnê jî her li van adresan peyda dibe.

DÛRÎK (ÇARÎNÊN) GEL Jİ HÊLA SARIZÊ

Lê keçikê keçika exa (axa)

Bencê zirav weka tixa

Bencê xwe serî xwe buxu

Heşê min çû ezî nême xwe

Tu kezewa dilî min e

Desmal şandiye nadne min e

Li ser navî min û xwe yazmîşke

Poşman dawin dadine min e

Şivan tu pezî xwe hê ke

Berî çerx ke berwe çê ke

Bêrîcîyan hatine rûniştine

Zû li berxa di bêriye ke

Ê rûdenî li ber derî

Hûn ci sond dexwin bi serî

Rindîye xwe serî xwe buxu

Ez kuştım, ci birîye serî

Çavnê lê ne çavê xeyal

Bencê zirav weka delal

Eze lêxim wî bukujim

Î be min va nawiye heval

Kaniye ke sarê li dih wan

Herime male sire şivan

Ba kes min û te nevînî

Ba şev li te bûme nîvan

Hasaka ci xweşê lê ye

Çav li min kir çîma neyê

Hûn mizgînê wî bi min din

Bibêñ i berwe te têye

Î dawestiye li pê ye

Çav li min kir çîma neyeê

Kê mizgînê wî bi min dê

Bibêñ i berwe te têye

2

Ê rûdenî li ber avê

Ez bang dekim ê nalive

Ev bi ci xweyî guwon e

Bi ber bayî kê dikeve

Qarşiyê malê gendyan meş e

Rinda min rûnişt li koşê

Şorê gendiyê daybûna min

Ba dungurçî nêñ li boş e

Davî derî gendîyan meş e
Dilê min jê neyî xweş e
Ba werî dilî min biki
Kî nekir ba xwûn verişî

Ez çir bikim ez çir bikim
Ne zariye k'ez gir bikim
Kî ji destî min bidare
Ezê di cigerê xwe kim

Dilê min i ji wî têşî
K'ez ci dewim i pê nêşî
Î qe di rûyê min meznakî
Sarxoş i terî li pêşî

Benge ke gir ê li pîye
Ê digeri li nav dîye
Ev çima ji min direvî
Min li nav keçikan dîye

Li ci min li sudekevî
Bibêñ bira li bakevî
Xeberî min ji tuştî tunu
Bi ber bayî ke dikevî

Şev e şev e nazlî şev e
Çav ji hevnawin ê serxeve
Min di xevna xwe da bibîne
Zatî dilê meyî li hev e.

3
Dadiwestî ci yî bi paye
Lê nemaye ar û haya
Çiqa bi xwe yî radî ye

Î şenakî warî peya

Wî dilê min ji xwe sar kir
Ve di kulê min da çir kir
Madem tu yî bî vî devî bû
Çima te şorê me gir kir

Mala rindê min li dûr e
Ê li ber nalêke kûr e
Ez bang dekim çima neyê
Î ku téda va ci hal e

Jér va têye delal delal
Herim pêva bibime heval
Ezê xwe û te çir bikim
Bi kesî ra mewe heval

Çavkani: Zeynep Bayrak

STIRANÊ ŞÎNAN

Çavkani: Rafet Kılıçalp Amadekar: Îrfanê amo yê Mala Hacomerî Karre

Dayik li ser keçika xwe ya ku li Kurdistanê şêhîd bûye distire

Min got gune ye, gune ye.

Ez ê dîn im ez ê dîn im.

Ez a herim çiyayêن Diyarbekirê, çiyayêن Dicle
û Licê bi ser xwe da bixilînim.

Ez a sîleha Gulkê xwe ji erdê hilînim.

Herim li çiyayêن Kurdistanê sawaşmış bim,

Heyfa Gula xwe ji dijmin helînim,

Îşlemê Gulkê xwe heynim, herim pê çiyayêن Kurdistanê bixemlînim.

Herin ji partîyê rica kin bêraqê Kurdistanê jê bistînin,
hûnin, pê mezarê Gulkê xwe bixemilînim.

Ez a bêm Gulê rabe serê xwe hilîne,
min zafera te qazamîş kir.

Agirî hundurî telebê xwe deynim.

Ez ê tebêm dunîya çiyayêن Kurdistanê li ber hev e.

Egîtan, şervanan hanî dayne çatışme, pişt i dayne tav e.

Neh sal in Gulka min ji mala min derkete.

Gundo çîkê warin, kesera dayikê, bavê.

Tebêm dilê min ji ber vê talebe ci qasî kul e.

Neh sal in bang tikime tebême; Gulê balgî kevir e, erd i şil e.

Min xebereka bi derewa ji Gulkê xwe da heyna.

Heta siwe da li ber xwe da girîm,

Min got; Xwedê Xwedê ma xweş be, ma tekala bikule.

Min got; dilî min i piling e, Gulê, Gulê, dilî min i piling e.

Berfekê li çiyayêن Kurdistanê li taleba li egitan daye şing e şing e.

Dayikan xwe daye benda efikê.

Wexta ku talebe ji serî çiyayan hatin kî bêdest e kî bêling e.

Gulika mina xerîp li çiyayêن Kurdistanê raketî.

Gulê Gulê cigerê min qurbanê, vêbalgîyê, vêbilingê.

Min got meka meka Gulika mina bişuratê bi dalxê porê meka.
Serî xwe li çûne heyna berî xwe ber ve min ke.
Bê "dayikê ez çûm heqê xwe li min helal ke".
Gundo min ji vê xerîbê ra orxanên dayne ser merike.
Min got; Ersîn here vêra bê, ma orxanên Gulkê min ji xwe ra rûke.
Bê dayika Gulê poşman bûye Gulê nake bûk e.
Min got keçika min qara gun e ji Heymanê
Gule Gule keçika min qaragun e ji Heymanê
Talebê lîsê dawistine bi gemiyê bi lîmanê
Gule Gule min umrê xwe pê biro
Bi gund bi gund bi te ra geriyamo.
Îşevê talebe çûye li Îraq e li Îran e.
Heta kêleka xwe nedim kêleka Gulka xwe
Ez a tim bêm şehîda min ramadîye li çiyayê Kurdistanê.
Min got wamo wamo, talebe mine wamo.
Ez siwa da rawum min qahwaltiya Gulkê xwe bi xwe da bero.
Gundo heta qapî entrê vêra derketimo.
De li min çax be dayikê çûme bi xatirê te tu min teva diav namo.
Min telaba xwe bi ervanî ji xwe cêkiro.
Çûye li çiyayê Kurdistanê malê çekiriye li perî zinaran devî çeman.
Ez tim tebême Gule ware mare, warê mare.
Gulkê minê ware mare.
Deriyê gulkî min ê agirî kurşûn eşer e.
Heta siwe da li balqon dawestiyam li ber Xwedê digeriyamo.
Tebêm Xwedê Gul caymiş ba li rê vegero.
Wexta Mesûdê min ketî hepsa Ulucanlara.
Berî xwe li ber çiyayê Kurdistanê vegerand,
Min got Gulê were li haqî birangî xwe bigere
Gundo orxana Gulikê min maye li pî ser e.
Min got wanda wanda Gulika min bi şûratê wanda
Siwe da taleba min a rabû li dayikê yan da.
Va ne bi haqî ne bi xam î
Taleba minê mîna çîçekê kesk e sor e zer e ti bostê da.
Min got wêda wêda Gulka minê xerîb e li çiyayê Kurdistanê wêda.
Siwe da egîtan, şervanan çekên xwe dayine omuze têne pêda pêda.
Sene doqsan uçê hat ji min ra got, Zure raba Gulik çûye cephe.

Min got keçê here deng meke mala Gulkê min şewitî bi serî da.
Min got Elî rabe ku ez kozê xwe heynim herim bi çolik xwe da.
Min got Gulê malik li min meşewitîne Gulê
Gulê malê li min meşewtîne
Te negot dayikê biryara min e.
Xerîbê minê li ser min soza bigerîne.
Ezê pişti Elî dikevime tebêma,
Rabe here çiyayên Kurdistanê wê xerîba min bigere biwîne.
Dujminê Gulkê mino biderxîne.
Heyfa Gulê mino ji dujminî TC helîne.
Min got mewalî mewalî Gulika minê mewalî.
Taye dengê va taleba va egîta, va şervana
Li çiyayên Kurdistanê ye saet pêncâ da li riya walî.
Gulika mina tê televizyonê tirka da di Anadolu Gorunumê da hate derê.
Min got Gulê Gulê min tu ji xewa siwê ranedikirî
Îşê te ci ye li serî çiyayên Qulpê li ser wê qumsalî?
Min got were were Gulikê minê were.
Li çiyayên Kurdistanê riyekê dewriya xwe daye bere
Min got çikê rabin ji Mesûd ra telefon kin.
Ma kincê wî dujminî bexe bi sîlehê va bavê sar e.
Çiyayên Kurdistanê Mesûd ji xwa zûva here.
Çike here li yaraliya min li birîndarâ min bigere.
Min got Gulê qurbanê şerî ketî derî, şerî ketî derî.
Vê talebê meslegê hayna nare serî
Gundo xwang û bira ji hev ras bûne dujmîne.
Ez a resmî Gula xwe deynim herim li terminala dawestim.
Ez a bêm "Mesûd tu dujminê Gulkê minî nakme çerî."
Min got "şev êşav e Gula min êşav e.
Çiyayên Diyarbekirê Dîcle, Lice, Cîzîrê berva hev e
Dujmin korûcû li Gulka min xistiye.
Bedena ji du mîtro li erdê ketiye.
Min got Gundo tarixê bavine doqsan üçê, bavên çep deftera bavên dosya xwe
Gulik bi Mesûd va qarşî avbûna dijminî ave.
Min go Gule Gule canê min tuşûnê canî te keve.

Gelo çîma kurdêن Anatoliya Navîn ji pere re "qayme" dibêjin?

Ev 20-25 sal in ku ez kurdêن Anatoliya Navîn nas dikim, cîranêن min in, hevalên min in û zarakêن wan jî şagirdêن min in. Kurdêن Anatoliya Navîn dema behsa kirîn û firotin, behsa pere dikin, nabêjin pere, dibêjin "qayme." Wek nimûne dibêjin min erebeya xwe bi 100 hezar qaymeyî kirî. Restoranga xwe bi 2 mîlyon qaymeyî kirî." û hwd. Min ji gelek kesî pirsî ka çîma ew ji lîraya tirkan re, ji krona swêdî re, ji ewro re, ji hemû cureyên peran re dibêjin "qayme?" Kesî nikarîbû bersiveke zelal bide. Dibêjin "em nizanin, lê hinek tirkêن Anatoliya Navîn ango cîranên me jî wek me dibêjin "qayme."

Çendek berê ez bi riya internetê ketim malpera Turkiye Cumhuriyetî Merkez Bankası. Û ez rastî çavkaniya gotina qaymê hatim. Ka em bi hev re bixwînin gotina qayme ji ku hatiye:

Perê kaxez ku jê re panqinot digitin cara pêşî di dema Abdulmecît di sala 1840î de bi navê **"Kaîme-î Nakdiye-î Mutebere"** derketiye. Wateya(maneya) perê kaxez e. Di dema Tanzîmatê de

ji bo ku reforman finanse bikin, perê kaxez yanî qayme derxistine. Ji perê kaxez zêdetir ji bonoyêñ xezînê re gotine qayme." Pêşî Qayman bi dest çêkirine, mohra fermî li ser xistine û wek perê kaxez derxistine piyasê. Demek şûn ve mêze kirine ku sehteyên qayman têñ çêkirin û baweriya xelke êdî bi van pereyên kaxez ango qaymeyan her ku diçe namîne. Dewleta Osmanî rabûye du sal piştire, di sala 1842an vê carê qayman di çapxanê de çap kirine. Belê, dîrok û çîroka qaymê bi kurtî ev e.

Her ku behsa pere û "qayme" bû ez dixwazim bi gelempêri di derheqê dîroka pere de jî çend hevokê din lê zêde bikim.

Li cîhanê cara pêşî çîniyan Berî Mîladî di sala 118an de pereyê çermîn bi kar anîne. Dîsa piştî Mîladî di sala 806an de çîniyan vê carê pereyê kaxez bi kar anîne. Li Amerîka di sala 1690î de perê kaxez hatiye çapkîrin. Di sala 1694an de jî îngilîzan banka navendî vekirine.

Stockholm 2006-01-08

SİRRA HEMÊ

Ida rojîyê bû. Li ber dukana gund Hemê Hûdê bi ber çavêن min ket. Ji camiyê derdiket. Min ïda wî bimbarek kir. Kalekî şêst, heftê salî bû. Ber bi pêş xar bûbû, tê bigota ew î duta bûyê. Ji nêzik da min mêla xwe dayê, didan di dêv da kufikî û feliqî bûbûn. Dilê min pê şewitî. Şorêن dayika min hatin bîra min. Wê loma li min kirin got, " rojîyê nagrî nimê nakî, qet newe xêrekê bike, pê sêwî yan xizanekî şâ bike... Ku te bi gorê min nekir, ez şîrê xwe li te helal nakim! „

Min ji xêran û xêrdayînê hez ne dikir. Xêrxwazên gund pirî cara, ne sewa ku yên mihtac şâ bikin, sewa ku xwe pê bipesîrin û sewa ku şûneke baş li dinya wî alî bi dest xin, xêr didan. Bi ser da, xêrên xwe aşkere dikirin. Va bi min pir bi bed dihat. Min ne dixwast ku mina wan bi xêrdayîneke aşkera kesên mihtac mehçûp bikim û serîyê wan di ber kim. Min ne dixwast wengna xizanî û mihtacîya kesan li rûyê wan xim. Loma min xêr ne didan ku min dida jî bi vêşartî dida û nedixwast kes jê hayadar bibe.

Dengê hundurê min got, « huro here serdana Hemê, jê ra rindîyekê bike, wî pê şâ bike! » "Herim an ne herim," min xwe bi xwe ra got û ketim nav merem û mitalan. Heşê min digot ne here lê dil û hîsê min digotin here.

Êvarî ku tarî kete herdê min berê xwe da mala Hemê. Bi xwe ra min çiqinek bir, tê da paketek çay, paketek şekirê qehwê û paketek jî tutin hebû.

Hem di xanîyekîji goz û mawenîyeki da bi tenê dima. Ew di jîyana xwe da qet ne zewicîbû. Digotin di piçûktîya xwe da ew bi nexwaşîya menecîtê ketiye û bi ser vê da, wekî ku tê gotinê, hevdeyên sérî sist bûne. Ji axzê heşan, têgihêştin û berdaçûyînê da, xelkê ew mîna merivekî fikare, bûdele û bi kêmanî didît.

Li gund qala du tiştên ku li Hemê dihatin mahkirin dikirin. Gava ku şor dihate ser tiştekî kevnibûyî, dirî û qulqulkîbûyî, digotin » ê bûyê desmala Hemê ». Wekî din ji digotin, Hemê rokê çûyê nav goristana gund, li ber gora Îdê Mamê dawêstiye û bi çoyê jê hayadar bibe.

di dêst da li gora Îdê xistiye. Mîna pir kesa min jî hekat û sira van tiştan ne dizanî û meraq dikir.

Liber pencera mala Hemê ez bîstekê dawestîm ku bizanim ka kes li ba Hemê heye. Tu deng nedihat. Min dengê xwe hendik bilind kir got, „Hemê çaxa te bi xêr be! Ez im, ez, Miçoyê Kudê me, mîvana qewûl dikî! „ pê ra jî min destê xwe bi dêri ra na û ketim hundur. Min çikina xwe deyna hêlê Hemê û got, „ va uda min ji te ra anî, bi navî Xwedê kî qebûl bikî! „ „Nedixwast Miço, tu xwaş bî, te zehmet kirîye!“ wî serî di ber da bi dengekî ji gewrîyê da li min vegerand. „ Te ci qey şik bir, ku tu hatî ser min. Xwedê ji te razî be. Ez î bi tenê me, tu kes bi ser min da naye“ bi dengekî kelgirî dewam kir. Ez pê êşiyam, ci derewa bikim, min çav şîl kirin.

Ji silavdan û xal û xatir pirsînê şûn da, min ji ber va li ser gazocaxê çayek çêkir. Sohbata me tîr bûbû. Li navberkê min jê pirsî got, “Hemê çima dibinê “ê bûye desmala Hemê?” Ya din jî, dibinê te bi ço li gona Îdê Mamê xistiye! Ez jî pir meraq dikime, eslê vê meselê ci ye? Hem pêçekê bê deng ma. Dest avête tewaxa tutinê, ji min û xwe ra dest bi pêçana cixarê kir û bi rû da got, „Miço min sira vê hîn ji tu kesî ra kat ne kiriye, ez ê ji te ra kat kim, lê dera ku tu wê belav nekî.“ Ez şâ bûm

û min lêvegerand got, „tu xwaş bî, ez kat nakim!“ Min bi guh û çavên belkirî berê xwe ber bi Hemê kir. Wî cixara pêçayî vêxist û nifteke kur kişand, dûmanê wê li xwe û li odê belav kir, dû ra dest bi katkirinê kir.

“Ez xortekî teze, çardeh, panzdeh salî bûm û ji mala Bekirê Homê ra diçûm kaviran. Keçikeke malê hewû navê xwe Medê bû û mîna lukisê vêdiket, wekî horîyê bû. Dilê min ketiwû wê. Li zewaca xwanga xwe ya mezin we ji çikina bûkê desmalek dabû min. Ez pê şâ bûm, mîna ku dibên ji eşqa ra firiym.” Wî desmal ji paş balîfê derxist û bi min nimand. Heqet jî desmal kevn bûbû, di pir deran da qulqulikî bûbû. “ Pencê sal e ku ez vê desmalê vedişirime. Ci xeş bûn, li ba min jî ku dilê wê jî ketibû min. Halbuku ez kî û ew kî...

Rokê min kavir berda bûn tunc û qeracên navberê zevîyên li hêla girê Morik. Ci gîya tê da hewû, ne bê ne jî qalê bike; xûrnig, hewşan, pêçek, qanik, guhbelik û mijik tê da li hev pêçikî bûbûn. Kaviran têr xwar, perçifîn, zik bi ser piştê ketibûn, mîna ku dibên, tê da zirq bûn dawestîyan. Min ew kişandin nav anizekê. Royê li ber nîvro bû. Min xwe li ser kêlekê dirêj kir ku piçekê vehêsim. Ez gavekê bi xwe da ketibûm. Mîna ku min xewnek dîtiwe, ci mêz kim, Medê xwe li hêla min dirêj

kiribû. Dilê min kire gurpegurp, min destê xwe ber bi wê dirêj kir û hîn ku destê min pê nebûbû, hema li ber çavêن min wenda bû; kete tonê pitikekê û li ser tayek gîya danışt û perik bakirin. Min dest dirêjî wê kir, firîya çû li cîyekî din danişt.. Ez ketim dû. Ew revîya min da dû...Li ser dara qanikekê danişt. Min ceketê xwe êxist û ji vêhiska da nêzîkî bûm û min bi lez ceket avête ser û bi çokan li ber dawestîyam. Min hewl dida ku wê di bin cêket da bigrim. Min cakê dît lingekî gir pêle ceket na. Min serê xwe helna, ci bibînim, Îdê Mamê yê ku parêzvanê (qorciyê) zevîyê gund bû, bi qelefetê xwe yê gir û gerîya, bi murizê xwe yê tahl mîna dêvekî bi ser min ra dawestîye. Dil li min qedîya, min got ez ê niha bi bin xwe da bikim. Bi hêrs gote min, "lo va ci hal e, ka kavirênu tu li ber li ku ne?" Ci mês ki, kavir her yek bi derekê da çûbûn û li nav zevîyên xelkê balav bûbûn.

Îdê Mamê merivekî bi xof û esebî bû. Kesî nedîwêrî ku xwe tê bide. Loma kiribûn parêzvan. Min zanîbû ku ew ê li min xe. Ez li ber gerîyam, min got, "Hemo qurban, Hemo heyran tu qesta min a.." şora min tevila bîrî got, "de hîş be, hîn î bi zimane jî, zû ke solê xwe

biêxe!" Ji neçarî min solê xwe êxistin. Wî ez gêrkirim, lingê min ber bi jor helnan û bi şiva ter li ser hev li binî lingêñ min xist. Ling li min pûc bûbûn, min got, ruhê min ï ku bikişê. Paşê ez birim dereke ku strîyê keran li pir bû û pêxas ez li ser strî birim û anim... Hasili mîna ku dibêñ, wî çîn ji min koz kirin. Va li min pir bi qahr hat, bê pê çire kî, devê min nesikinî, min got, "ez vê li te bernadim ku ez gir bûm, ezê heyfa xwe ji te helnim, ezê te bi xi.. bigîhînim herdê!"

Ku çing vabihîst rasere min da, çav di sêri da dilîztin, mina ku dîn bûbû. Wî ezîyetênu ku bi min kiribûn dubare kirin. Bi ser vê da, min sond xwar ku ez ê rokê, ku ez mezin bûm, hêyfa xwe ji wî helînim.

Dem û dewran rabirtin, ez mezin bûm û min xwe dabû benda wî, ku li dereke xewle rast were ku ez pê rakişînim. Lê nebû nesîw. Rokê min bihîst , gotin Îdê Mamê dinya xwe guhêrîye. Demekê ez di nav goristanê gund ra derbas dibûm, gora Îdê bi ber çavêñ mi ket. Ez çûm ser, li ber gorê dawestîm, bi ço sê, çar cara lêxist. Hena ji va dîtin, çûn li nav gund belav kirin. Hal û hekat va ye."

Siya kurd li Thusisê

Carina li bajar yan ji li gundên Swissrê, ji bo berhemên min sihbetan çedikin û ez ji diçim û ji kitebên xwe beşek dixwînim. Cari-na sihbet baş dibe, însanên bi çavzêlk û meraqder têن, carina ji sihbet ku ji ewqes sirê de dibe ku meriv pişî çend rojan hemû ji bîr dike.

Nêzîkî du salan, carekê ez li bajarokekî Swîssre di nav çîyan de bi navê Thusisê bûm û min li sînamayekê ji kitêbên xwe dixwand. Her tişt mîna ku min texmîn dikir derbas bû; wek herdem min ji wan re behsa gundê xwe yan ji jîyana pêneberî kir, ew ji pirsîn li ser gundê min yan ji li ser xortaniya min.

Lê piştê ku însan belav bûn, bala min kişand ku jineke ciwan û mîrikêkî rûspî li ber şano dawestîne û li min miqêt dibin. Min ji xwe re got, ew xwedîye sînema ne û dixwazin paşê wan deran paqîj bikin. Berî ku ez xatirê ji sazgêrê evarê bixwazim, kaloyê rûspî ku dicirifi hat cem min û hindik bi fêdî rîca kir ku ez li quncik bi wan re du gotinan deng bikim. Min got erê û destê xwe direj kalo kir, destê wî germ bû. Berê min texmîn kir ku ew ji sekta "şahîdên jehovas" bin û dîsa dixwazin broşûra xwe bidin min û hin bêjin ji ku ew dixwazin werin serlêdana min. Ez bi kalo re çûm quncik

lê fikra min ji li ser manayekê bû, ka ez bêm ci ku eger wî got, ew dixwaza bê mala min.

Keçika xama ku li quncik davestî bû dest direjê min kir û navê xwe ji got. Navê wê niha naye bîra min. Nêzîkî deqîqekê em bê deng bûn, te bigota em li benda destpêkek bûn. Paşê min got: "Ez guhdariya we dikim! Ez divê hîn bigihêm trenê..."

Keçika xama ji kalo re bi elmanî got:

"Tu dixwazî dest pê bikî? »

Kalo ji got ku bila ew dest pê bike.

Keçikê got:

«Ez hindik dicirifim. Fermo tu dest pê bike, ez ji dawî bînim, eger tu tiştên bîr kirin yan ji nehatin bîra te.»

Kalo pêşî keçik da nas kirin.

"Ev însana li maxaza Migrosê li ser kasê kar dike, dê û bavê wê li bajarêkî din in, birayek wê heye, lê têkiliya wan bi hevdû re tune. Ez alikarîya wê dikim..."

Keçikê got:

"Te tişték bîr kir: Ez di xaniyê te û jina te de dimînim..."

"Erê rast e" got kalo, „tişték ku em ji te bipirsin ev e: ew keçika hemşire ye, sê sala bi yekî kurd re zewicî bû, lê

zewaca wan nemaşıya. Em dixwazin ji te bipirsin ka ji bo ci ew nemaşıya!"

Ez mat bûm, te bigota ava keli bi serê min de rijandin.

Keçikê çavêن xwe tijî pirs berda bûn min, te bigota min ew kiriyê cihê yekî kurd û ew min sûçdar dike ji bo zewaca xwe ku nemaşıye.

Paşî wan hindik, carina kalo, carina ji keçikê, ji çiroka wan du xortan çend serpêhatî gotin:

Xortê kurd pênebar bû wexta ku ew zewîcin. Keçik dibêje: «wî hîngê ji min pir hez dikir!» Dema ku dewlata Swîssrê ji xort re name dişîne ku ew welatê wan terk bike, herdu evîndar dizewicin. Piştî sê mehan xort destûra xwe distîne û ew tevî hev diçin Tirkiyê. (Wexta ku kalo wisa deng dikir, keçikê xwe teve şorê kir û got: «malbata wî ji min hez dikir, her mala ku em çûyî, em didan ser serê xwe, ji me re mîh serjêdikirin...) Xortê kurd li fabrîka kar dike. Sê rojan li piştî ku wî dest bi kar kir, ew diçe garajeke û erebeyek xwe ya nû bi kredî distîne. Ehliyata xwe tune, lê keçik êvar bi êvar li kêleka wî rûdine ku ew ajotinê hîn bibe. (Keçike got: «Min pir zehmet ji bo wî kişand) Havînê ji ehliyeta xwe digre û bi trembelê diçe Tirkiyê. Dîlana lawikê xwenga xwe heye, lê ew dixwaza ku bûke li trembola xwe bike bûk. Hin ku li Tirkiyê bû, ew ji birayêkî xwe re vîze distîne ku ew bê Swissre. Xort bi xwe li ser riya hatinê li Bulgaristanê qaza dike, trembelâ xwe davêje çopê, xwedê mezin bû ku wan sigortêk xwe hebû ku pere

dan. Lê xortê kurd ku hîn bibû trembelê çend rojan bi şûn de çû û trembolêk nû kirî û anî. Dîsa bi kredî. Jina wî ku ji wî pir hez dikir ducanî bû û piştî neh mehan keçikek wan dibe. Navê wê dikin Berfîn Sofia. (Keçike got : «ji bo ku nikarim hem bişuxulim û li zarok xwedî bikim, min Berfîn Sofia daye malbata wî kalo yî, na na, ne ewladî!)

Kalo dît ku ez li saeta xwe meze dikim, wî got: Ez ê gotina xwe qût bibirim: Paşê mîrê vê keçikê birayê xwe bi peran, dori pencî hezar frank, zewicand, lê polîs li hişyar bû, birayê wî ji şandin Tirkîye, pere ji weng çûn...

Ji xortê kurd re, bi trembelê û zewaca birayê xwe nêzîkî sed hezar frank deyn çêdibe, fabrîka ku ew li kar dike, wî û nîvê karkeran derdixe, ew dixwaze ku jina wî bi wî re alikarî bike, lê vê ji perê xwe tunebûn. (Keçike got : Hizûra me nema. Mîrê min bi hêrs bû.) Du rojan berî ku hêciz tê mala wî, ew Swissrê terk dike û bê xeber diçe.

Wan herdu çav berdabûn min, ji min bersivek dipan. Min mîze kir ku mesela wan giran e. Diviya bu ku ez xwe iro ji destê wan xelas bikim. Min ji kaloyê rûspî û keçika ciwan re got: „ez nikarim bersiva van pirsên dijwar bidim, hevalekî min î sosyolog heye, ez ê herim mal, telefona wî bîbinim û ji we re bikşînim.“

Berî ku ez ji sînemayê derkevîm, kalo li ser kaxizeke numera telefonek da min û ji bo alikariya min a comerdî spas kir.

KOMA HAWARA KURDÎ

(© www.amidakurd.com)

1- Zimanê kurdî (kurmançî û zazakî) li Tirkiyeyê di rewşike gelekî xerab de ye. Polîtikayên pişaftinê (asîmîlasyon) û rengê wê yê nû xwepişaftin (oto-asîmîlasyon) gihîştiye asteke metirsî. Her çiqas polîtikayên pişaftinê yên dewletê ji ber têkoşîna gelê kurd a demokratîk û guherînên li cîhanê iflas kiribe jî, pêvajoya oto-asîmîlasyonê ku bi destê kurdan bi xwe tê meşandin, hêviyeke mezin dide zîhniyeta paşverû, lewre jî di vê polîtikaya xwe ya kevnisperest de israrê dikan. Jixwe modela ku Tirkiyeyê di pêvajoya endamtiya Yekîtiya Ewropayê de daye ber xwe modela Fransayê ye, ew jî bi tenê mafê xwekujiyê dide zimanên bindest. Lewre jî endamtiya Yekîtiya Ewropayê jî bi tena serê xwe pirsgirêkê çareser nake.

2- Tevgera demokratîk a gelê kurd tevî hemû hewldanên xwe jî di warê parastin û pêşvebirina zimanê kurdî nekarî bibe xwediyê bernameyeke yekgirtî; gelek bername û biryarên li ser vê mijarê hatibûn girtin, di pratîkê de têk çûn, ji ber ku kadroyên siyasî helwesteke rast li dijî oto-asîmîlasyonê negirt; bi tenê doza zimanê kurdî wekî navgîneke propogandaya siyasî bi kar anî. Heta piraniya kadroyên siyasî di jiyana xwe de piştevaniya polîtikaya xwepişaftinê kir. Ji ber vê yekê bi sedhezaran zarokên ku navê wan bi kurdî ne, lê bi xwe qet bi kurdî nizanin derketine holê. Di piraniya sazî û dezgehêن kurdî de tirkî bûye zimanê serdest. Piraniya kadroyên saziyan bi zimanê kurdî nizanin, ên ku dizanin jî zimanê kurdî pir kêm bi kar tînin.

3- Kursên zimanê kurdî ku bi hezar qeda û belayî hatin vekirin, ji ber vê zîhniyetê di demeke kin de têk çûn û bi biryareke nedemokratîk hatin girtin. Her çiqas ji girtina kursan re hinek hincetên siyasî hatibin nîşandayîn jî, girtina kursan têkçûnek bû. Bi vê yekê hêvî û daxwaza gel şikestekeke mezin xwar.

- 4-** Li hemberî vê rewşê pir kesên ku dilê wan li ser zimanê kurdî dişewite bêhevî dibil, dixeyidin û diçin li mala xwe rûdinin. Hin kes ji wan jî hêviya xwe bi Başûr ve girêdidin, dixwazin bi piştevaniya hikûmet û rêxistinêن Başûr tiştekî bikin. Pêşveçûnêن li Başûr hêviyekê dide mirovan lê bi baweriya me divê gelê kurd li Bakur pirsgirêka xwe ya zimên bi destê xwe çareser bike.
- 5-** Li hemberî vê rewşê pêdiviya me bi xebateke sivil û demokratîk heye. Hemû mirovên kurd li ku dibil û ji kîjan bîr û baweriya siyâsî dibil ne xem e, divê ji bo parastin û bipêşxistina zimanê kurdî bikevin nava liv û xebatê. Hemû kesên ku dixwazin ji bo zimanê kurdî xebatê bikin, li her cihî hawara xwe bigihînin hev, kom û komeleyan ava bikin û di encamê de Hawara xwe bigihînin cîhanê.
- 6-** Li Stenbolê me bi vê mebsetê komeke bi navê Koma Hawara Kurdî ava kiriye. Ev kom dixwaze roj bi roj xebata xwe berfireh bike, rengê tevgereke sivil û demokratîk bigire. Ev kom dê deriyê xwe ji hemû kesên ku dixwazin ji bo parastin û pêşvebirinâ zimanê kurdî xebatê bikin re veke. Dê piştevanî û hevalbendiya hemû kes û saziyên ku ji bo zimanê kurdî xebatê dikan bike. Lê belê dê li dijî hemû kes û saziyên ku bi awayekî aşkera û nehêni ji bo pişaftina zimanê kurdî xebatê bikin, têbikoşe.
- 7-** Ev kom li aliyekî dê ji bo mafêن rewa yên gelê kurd, wekî perwerdehiya bi zimanê kurdî, weşana bi zimanê kurdî têbikoşe, politîkayêن qedexeker û pişêvker li ber çavan raxe û gelê kurd li hemberî van polîtîkayan bixe nav tevgereke demokratîk. Li aliyê din jî dê di pratîkê de ji bo ku kurd li zimanê xwe xwedî derkevin, zimanê xwe hîn bibin û hîn bikin xebatê bike.
- 8-** Em wekî koma Hawara Kurdî xwedî derketina li zimanê kurdî, bi tenê wekî qirîna sloganekê nabînin. Pîvana rasteqîn a xwedîlerketina li zimên pratîk e. Her mirovê/a kurd di jiyana xwe ya rojane de divê zimanê kurdî bi kar bîne. Di serî de malbata xwe, kesên li derdora xwe hînî zimanê kurdî bike, li berhemên ku

bi zimanê kurdî derdikevin xwedî derkeve; pirtûk, kaset, CD'yên bi zimanê kurdî bikire; li film û şanoyên bi zimanê kurdî temaşe bike. Li bazarê firoşkar û kargehênu ku zimanê kurdî bi kar tînin tercîh bike. Li aliyê din hemû kurd divê li hemû nirxên xwe yên devkî û nivîskî xwedî derkevin, wan biparêzin û ji bo pêşvebirina zimanê kurd bi kar bînin.

9- Li Tirkîyeyê her wekî aştiya civakî aştiya zimanî jî nîn e. Zîhniyeta paşverû ev 80 sal in Tirkîye kiriye goristana zimanan. Lewre aliyekî têkoşîna me jî dê ji bo pêkanîna aştiya zimanî be. Em wekî kom hîyerarşıya di navbera zimanan de red dikan. Zimanê pêşketî û lipaşmayî, zimanê biçûk û mezin, zimanê xweşik û nexweşik nîn e. Hemû ziman xweşik in, hemû ziman xwîşk û bira ne. Em wekî aktîvîstên zimanê kurdî tu zimanên din ji xwe re wekî neyar û hevrik nabînin. Bi vepêçan em pirzimanî û duzimaniyê wekî merceke pêşketin û nûjeniyê dibînin. Zîhniyeta paşverû bi polîtîkaya asîmîlasyonê yekzimaniyê li ser me ferz dikan, em vê yekê napejirînin. Di vî warî de ligel pêkanîna hişmendiya zimanî di naya kurdan de, em ê ji bo hişmendiya aştiya zimanî di nav gelên din de jî xebatê bikin. Em di serî de kes û saziyên ku dixwazin zimanên xwe biparêzin û bi pêş bixin wekî hevalbendêne xwe dibînin.

10- Em wekî Koma Hawara Kurdî bang li hemû mirovên kurd dikan ku li zimanê xwe xwedî derkevin, însiyatîvê bigirin destêne xwe, li benda dewletê û tevgerên siyasî nemînin, bi vepêçan di vî warî de zorê bidin kadroyêni siyasî da ku di vî warî de bibin xwedîyiye helwesteke rast û durist û zorê bidin dewletê da ku dev ji polîtîkiya xwe ya red û pişaftinê berde, rastiya zimanê kurdî bipejirîne û derfetêne pêwîst ji bo parastin û bipêşketina zimanê kurdî pêk bîne.

"KAMBAXA VÊ SIRGÛNÊ"

Di folklorâ kurdî de stranê xerîbiyê

*"Eger gava yek mizginîya delalîkê min
Ji welatê xerîb û gurbetîstanê ji min re bîne
Bila qasidê Qoce Felekê,* Hezretî
Ezraîl îro werê ruhê min bistîne!"*

Dema ez piçûk bûm diya min carina ji min re digot "filan-kes çûye welatê jorê". Ez piçûk bûm, min nizanibû, jîr kîder e û jor kîder e? Min tenê li ezmîn dinêrî, ezman dihate bîra min. Van gotinêni diya min bi rastî hişê min tevlihev dikir. Paşê ez fêrbûm ku diya min îfadeya *welatê jorê* ji bo welatêni xerîb wek bajarêni mezin yên mîna Îstenbol, Îzmir û Enquerê bi kar aniye. Di van salan de gelek kes ji gundê me û gundêni mayin ji bo ku debara xwe û aboriya xwe bikin, diçûne bajarêni mezin. Ji bo ku karekî ji xwe re bibînin, bi mehan li van deverêni xerîb dihêwirîn, çavêni zar û zêcêni wan bi mehan, carcar bi salan li rê diman. Ev kurdêni neçar bi taybetî li *Taxa Ataturk* ya qezaya Bornovayê li bajarê Îz-

mirî berev dibûn, ew der ji xwe re wek war hilbijartibûn, heta îro ji bi sedan malbatêni kurd li wir mane. Paşê ez derketim hatim Ewrûpayê, piştî gelek salan vê carê diya min dengê hildabû kasetekê, di beşeke vê kasêtê stranek avîtibû ser min, rebenê şîret li min dikir û di cihekî vê stranê de wiha digot: "Xerîbî pir çetin e, tu ne çek e / Milê xwe têra neke!". Di devoka dorberê Qersê de ji kincan re çek dibêjin.¹

Xerîbî, gurbet, dûrî û dûrwelatî di stranêni kurdî yên kevn de temayeke bingehîn pêk tînin. Kesêni hatine sirgûni kirin, bi salan leşkerî kirine, ji bo kar çûne deverêni din û wek penaber (miltecî) li welatêni dereke mane hertim ji yên mayî re bûne êş û keder. Herdu alî ji li benda hev

Kartpostalekî Samuel
Hirszenberg ya bi navé
"Golus" exile



mane. Koçerî, koçberî û koçemalî bûye perçekî jîyana kurdan. Bi dil an jî bi zorê kurdan gelek caran war guhertine.

Serpêhatî, macera, enînivîs û dîroka kurdan çawa tê xuyan hertim *ferhenga xerîbiyê* "dewlemend" kiriye. Kurd hertim bûne koçber, penaber û ketine li ser rê û dirban (*homo migrantus*). Ev yeka serpêhatiya Ahaverus, cihûyê ku hatiye ceza kirin wekî heta mirinê rîwî û koçber bibe, tîne bîra mirovan. Rêya Ahaverus di helbesteke helbestvanê swêdî, Viktor Rydberi de li Kurdistanê jî dikeve.²

Ez dixwazim vê nivîsa xwe dîsa bi vê gotina kurdî ya hînkar û rênîsandar berdewam bikim: "Xerîbî pir zor e!". Li xerîbiyê per û baskêni mirovan dişkêni, îtîbar û rûmeta mirovan kêm dibe. Rutbeyêni mirovan yek bi yek têjêkirin (degradation). Xewnêni şevan li mirov heram dibin. Qaydekî xerîbiyê heye: li xerîbiyê mirov her winda dike! Li welitekî xerîb mirov nikare

wek li welatê xwe wisa serbest bibe, bilive û tevbigere. Çawa di stranekê de tê gotin dema mirov ji dost û nasêni xwe bi dûr dikeve, mirov li xerîbiyê "bêqedir û bêrûmet" dibe.³ Bi taybetî kesen ku diçin welatêni xerîb wek welatêni Ewrûpayê, xerîbi gelek caran ji bo wan dibe sefereke bêveger! Bilêta vegerê nayê veqetandin! Eger bê veqetandin jî ev bilêta bi salan û hin caran jî heta mirinê di berîka mirovan de (cêv) dimîne. Ji ber ku roja vegerê li li sirgûnê û li xerîbiyê hertim tê dirêj kirin. Çawa tê xuyan babeta koçberî, sirgûn û xerîbiyê di zimanê kurdî de wek babeteke balkêş e. Peyva sirgûn ji kîderê hatiye ketiye zimanê kurdî ez nizanim. Lê belê ev peyva li derdorê Şîrnaxê wek *sergûm* tê bi kar anîn û -gûm tê menaya windabûnê.⁴ Kurdêni Sovyeta kevn digotin cîsihitî (-bûn, -kirin). Di kurdî de hin peyvîn jî hene ku li cihê sirgûnê têni bi ar anîn, wek nefî (-bûn, -kirin).

Di van salêni dawî de gelek kurd,



Adam û Eva ji baxê Îremê bi dûr xistin

bi sed hezeran derketin dervayî welat, xwe avêtin ber bextê welatên biyanî û li van deran star bûn, hêwirîn. Piraniya wan, milteciyên politîk bûn. Di cîhê peyva *miltecî* di destpêkê de peyveke mayîn tune bû, hin kesan di nivîsên xwe de wek mîsal peyvên *revok*⁵ û *tengezar*⁶ bi kar anîn. Lê belê van peyvan di zimanê kurdî de zêde cîh negirtin. Di hin çavkaniyan de peyvên *cîhil* û *derwar* hatin bi kar anîn. Di dawiyê de çawa em dibînin peyva *penaber* zêdetir hate peyivîn û nîvîsîn, wek ifadeya *penaberên politîk*. Ew kesen ku koçberî welatên xerîb bûn û xwe avêtin ber bextê van dewlatan, bi dirêjaya salan li wir man.

Li van welatên Ewrûpî çend peyvên lafîniyêñ mayinketinnav zimanê kurdên li welatên dereke wek peyvên *deportation*

(sîrgûn), *migration* (koçberî), *diaspora* (belavbûn), *exil* (xerîbî), *getto* (taxa xerîban), *asyl*, *asylum*, *azyl* (starbûn)... Hin peyvên erebî ku koçberiya kurdan nîşan didin pir caran di nivîsên kurdî de derbas dibin wek peyvên *mihacir*, *mihacirî*, *mihacirtî*, *mişextî*, *mişextî bûn*, *nefi*, *nefibûn*, *nefikiri*...

Di zimanê cîrokî de mirovan berê xwe dane oxirê, pişta xwe dane felekê, berî beristan, çol çolistan, terkeserî (terkeselatî) dinêbûne, çûnerderdiketine welatê hat-nehatê, çû-nehatê û gelek caran derbeder, serserî û perişan bûne. Di zimanê kurdî de ifadeya çolê ketin heye wek mîsal çawa dibêjin: "kurê kerê çolê ketiye!" ango tê maneya ku mirov ji war û cîhê xwe dûr ketiye, hişê xwe winda kiriye, dîn bûye û bûye mecnûn. Ev yeka destana *Leyla û Mecnûn* tîne bîra mirovan. Dema mîrxasê destanê, Mecnûn li pey rêça jinxas Leylayê dikeve, di dawiyê de dîn û dîvane dibe. Di stranê xerîbiyê de jî ev derbederî heye. Di esasê xwe de dema mirov hemû stranê xerîbiyê baş analîz dike, mirov dibîne ku di bingehê van stranan de tirseke veşartî heye, ew jî "tîrsa windakirinê" ye. Ev tîrsa, tirseke mezin e, dikare wek mirovên bi çolê ketine û mecnûn bûne wisâ mirovan zêdetir biêşîne û nexwaş bike. Warguhaziye, derwari û koçberiyê li ser mirovan hertim bandûreke nebaş hîştiye. Mirov vê yekê di stranê xerîbiyê de gelek bi eşkere û baş dibîne.

Motîfa *welatê xerîb* (welatê dereke,

welatê biyanî) çawa di lîteratura cîhanê, wisa jî di ya kurdî de cîhekî taybetî digre. Di folklorâ kurdî, wisa jî di edebiyata kurdî ya nivîskî de ev babetâ cîhekî fireh digre. Bi taybetî bi sedan stranê kurdî hene ku di derbarê xerîbiyê de hâtine gotin. Heta niha qasî ku ez pê dizanîm tu lêkolînek an jî nivîsek di derbarê van berheman de nehatiye çêkirin. Nemaze folklorâ kurdî (edebiyata devkî) di vê babetê de material û malzemekî dewlemend û rengîn pêşkêşî me dike. Di hemû stranê xerîbiyê de tê dîyar kirin ku xerîbî wek rewşek an jî bûyerekê tiştekî nebaş e. Xerîbî, qeza, bela û felaketekê mezin e ku tê serê mirovan. Xerîbî nikare bê tarîf kirin, ewqas dijwar e. Di kurdî de ev yeka wiha tê zimîn: "Xerîbî pir zor e" û hin caran jî "xerîbî ne tu kar e" tê gotin.

*Xerîbî ne tu kar e,
Forma rojê: bi hesavê, bi defterî, bi jimare,
Wextê xerîbê xelqê xerîbîyê têñ,
Xerîbê me xerîbîyê de dimînin
Mînamî kulekeke pey keriyane.⁷*

Çawa di vê stranê de jî tê xuya kirin di dema xerîbiyê de wext dirêj dibe, wext nayê kişandin. Çav hertim li rêne. Şewata bêrkirinê angorî pîvanên wek dûriyê, hezkirinê tê guhertin. Tecrûbeyên kurdan nîşan daye ku xerîbî bi eş, bi jan û bi keder e. Gelo çîma xerîbiyê ewqas bi hunerî û artîstîk di stranê kurdî de cîh girtiye.

Dema du kesên ku ewqas zêde hev hez dikin, ji hev dûr dikevin û ji hev diqetin halê xerîbiyê peyda dibe. Eş, jan û kedereke mezin him li bal yê çûyî û yê mayî peyda dibe. Bi baweriya min yê mayî û yê çûyî bi saya van stranan ve bi hevre dipeyîvin, dikevin têkiliya û didin-distînin. Hêvîkirin, hesret, bîrkirin di van stranan de bi şewat tê tarîf kirin. Mirov xwe dinya çîrokan de dibîne, wek li welatê hat-nehatê. Carina çûyîn heye, lê belê hatina wan tune ye. Tecrebûbeyên kurdan yên sedsalan ev yeka baş nîşan dane:

Gelek kes li xerîbiyê nexwaş ketine, di şeran de mirine, qezayek hatiye serê wan û li wan welatê xerîb mirine. Ev xeberan reş gelek caran bûne babetên stranê xerîbiyê û hin caran jî nêzîkî stranê şînê dîbin. Ji ber ku desten dildar, dilketî û hezkirian di mercen xerîbiyê de nikarin bigihiêin hev, ew dûrîdest in, bi gotineke din ew bi dest nakevin. Di zimanê kurdî de tu peyv qasî peyva dûrîdest maceraya dildaran û hezkirian li xerîbiyê nikare tarîf bike û bîne zimîn.

Di folklorâ kurdî de stranê xerîbiyê zêdetir ji bo kesên ku sirgûn bûne hatine gotin. Sirgûnî gelek zehmet hatiye dîtin. Bi zorê ve mirov ji erdê kal û bavê xwe hatine qetandin û dewletê ew şandine cîhîn nenas û dûr. Li jêr di strana *Bavê Hamê* de kesê/kesa mayî bi kesên sirgûnbûyî re dipeyîvin:

Bavê Hamê

*De lo-lo, lo-lo, lo-lo, lo-lo, lo-lo, lo-lo-lo,
Ezê çûme mala bavê Hamê, weyla min dêranê,
Bavê Hamê ne bi male,
Dibê, milê bavê Hamê girtibûn, şandibûn
kela Stenbolê, nizanim çimaye?*

...

*Kulê tu têkevî mala Roma xayîn,
Destê kekê Hemo girtin bêsuc û bêgune,
Bi mixenetî dame kambaxa vê sirgûnê,
Çawa kesek xweyê xêrê tune
Cabekê xêrê ji kekê Hemo, apê Gulîzarê ji min re bîne?
Ez nemînim, ez nemînim,
Paşî kekê Hemo, apê Gulîzarê, li dinyayê sax nemînim.⁸
...
Ezê çûme Musila xopan, min bala xwe daye
Kekê Hemo li mal nîne,
Îro sê roj û sê şeve dilê min kulî merezî,
Kovanî, derdî bi birîne,
Ji derdê kekê Hemo, apê Gulîzarê min haj serê xwe tunîne,
Çavê min ji hêsiro xalî nîne.⁹*

Di salên seferberiyê û salên revê de dema gelek kurdên dorberê Qersê, Agirî û Wanê derbasî Sovyeta kevn dibin, hinek nas û pismamên wan li ser erdê Tirkîyê dimînin. Di salên şer de gelek kurdên êzidî derbasî aliyê Ermenîstan û Gurcistanê dibin. Vê koçberiya kurdan ya ne bi dil gelek malbatêñ kurd û neferên wan ji hev veqetandin. Peyva **rev û bez** di zimanê kurdî de cih girtiye. Him ew kesêñ mayî û him jî yên ji sînor derbas bûne, çûne li aliyê Sovyetê bi salan bi hesreta hev mane.¹⁰ Dı salên 1930yî de Ermenîkî kal, bi navê Arakel Eloyan ji bo hesreta

welatê xwe derbasî aliyê Tirkîyê dibe û dixwaze erdêñ kal û bavê xwe zîyaret bike. Lê belê çawa di pirtûkê de jî tê xuyan ev gera wî wisa bi hêsa derbas nebûye.¹¹

Di edebiyata kurdî ya Sovyeta kevn de mirov carina rastî van nimûneyêñ berhemên xerîbiyê tê. Ew strana navdar ku bi salan li ser zar-zimanê şeniyê Serhedê geriyaye:

"Weylê dînê çîya bilind in te nabînim!" yek ji wan stranêñ here hezkirî dikare bê hesibîn.¹² Ew cihêñ sirgûnê di stranêñ kurdî wek cihêñ wêran, kavîl, xopan, dêran û kambax têñ tarîf kirin,

wek cihêñ xerabe û xirbe têñ dîtin. Di vê strana jêrîn de malbateke ku ji Serhedê, ji zozanêñ Serhedê sirgûnî deşt û germistana Dîyarbekirê bûye, gazin û loma li vî meskenê teze dike û xerîbiyê dikşîne:

*Welatê Serhedê li sînorê vê Îranê,
Îsal ji pêra koçerî çawa
şunda ketin ji zozanê,
Xalîqo, tu serê sebabâ
dewletê re qebûl nekî,
Çawa destê me ji cî û warê me qetandin,
Berê hêsiro me dane welatê Dîyarbekir,*

Na welle, deşta Bişêriyê,
 germe, germistan e?
 Bavo, welatê me nîne
 Welat, welatê xerîb e,
 Delîla welatê Serhedê.
 Bavo, welatê Serhedê, li vî girî,
 Hêsîrê rût-tezî, tî û birçî lê hêwirî,
 Xalo, tu serê sebaba dewletê re qebûl nekî,
 Çawa îsal ji pêra berê hêsîrê me
 dane deşta Dîyarbekirê,
 Germistana Bişêriyê, em ji
 zozanan mane gêrî?
 Bavo, welatê me nîne,
 Welat welatê xerîb e,
 Delîla welatê Serhedê.¹³

Ji aliyê din Dîyarbekir ji bo kesên ku zaroktî û xortaniya wan li wir derbas bûne, her çiqas germ be jî, bêgûman bajarekî gelek şîrîn e wek stranek dibêje: “Dîyarbekir mala min e!”. Ev danasîna gelek girîng e. Dema mirov xwe di mala xwe de dihesibîne, li bal nas, heval û hogirêng xwe ye, wê demê xerîbiyê nakşîne. Mirov vê evînê, hezkirin û kêfxwaşiyê di van xetan de baş dibîne: “Dîyarbekir mala min e!”.

Çawa têzanîn iro bi sed hezaran kurd li welatên Ewrûpayê dijîn, li welatên xerîb û biyanî kar dikin. Di van stranên dûrî û xerîbiyê de gazin û lomeyên mezin li van welatan tênkirin. Ji Anatoliya Navîn bi hezaran kes iro li Ewrûpayê dimînin. Di destpêka vê koçberiyê de tenê mîrî dicûn, jin li van gundan de tenê bi serê xwe diman, hejmara mîran yekten kêm dibûn:



Karikaturekî Mamoste ku sîrgûne temsîl dike

“Qurbana we me werin carekê mehla me bigerin / Welle ji jinan bêtir mîr têda nemane!”¹⁴ Dema gelek kes bar dikin û koçberî welatên biyanî dikin, cîhîn kal û bavêng wan xalî dîbin, kes li van deran êdî namîne û kilîtan deriyên xwe dixin, terkeserî dinê dîbin. Yek ji wan dengbêjîn kurdên Anatoliya Navîn, Remziyê Kurd (Kurt Remzî) vê koçberiyê wek “çerx bûm geryam li vê dînyê” dinavîne û van seferan wek destpêka tunebûn û mirinê dihesibîne:

*Çerx bûm geryam li vê dînyê
 Bêriya te kir xewen min nê
 Lîlê çavêng te nabînim
 Suna girî xwîna reş tê.
 Sirum sirum sirmûş dîbim
 Ro bi ro tewa dîbim*

*Hawar derdê min ci giran e
Dost digrîn dijmin şâ dibin
Vê qûrbetê omrê min bir
Hesretê ceger li min qul kir
Ez li ber mala xwe digerim
Te hustiyê min bukmîş kir.*

*Sirum sirum sirmûş dibim
Ro bi ro tewa dibim
Hawar derdê min ci giran e
Dost digrîn dijmin şâ dibin.*

*Giş li vir çûn li qurbanetê
Giryê min nema xwîna sor tê
Dor-cînarno gi bibîsin
Qet gunê we li min nayê.*

*Sirum sirum sirmûş dibim
Ro bi ro tewa dibim
Hawar derdê min ci giran e
Dost digrîn dijmin şâ dibin.¹⁵*

Di van stranan de jan, êş û kedereke wisa mezin heye, êdî “bese!” tê gotin. Çavêن wan bi salan rê de mane û êdî sebir nemaye. Di vê strana ji derdorê Mereşê de jî baş tê xuyan ku dûrî û xerîbî êdî nayê kişandin.

*Anê halê me va ye, etê halê me va ye
Tu sebra min nemaye
De bes e keko bes e, de bes xwangê bes e
Çavê me yî li rê maye
De bes e zalim bes e, çavkê me yî li rê maye
De were keko were, de were dostê were
Bîrîna min pir xetar e
Li gurbetiyyê bi tenê ustî min xwa re...¹⁶*

Leşkeriya salên berê bi salan ajotiye. Di van salan de îmkana şandina nameyan, telefon û qanalên ragihandinê yên mayîn tune bûne. Herdu çavêن wan hertim li herçar rêya mane, rûniştine hêvîya delaliyên xwe sekînîne. Vê yekê li ser mirovan bandûreke nebaş hiştiye. Wek di strana jêrîn de jî xuya dibe rebena jînikê heta mîrê wê ji leşkeriyê hatîye nîvê (felqek) porê wê spî bûye:

Gede lawikê min çû

*Gede lawkê min çû eskeriyê derengî bû
Cabeke ne bi xêrî ji min re hatibû
Divê: Gede lawkê te tevî Roma îkîncî bû.
Heya gede lawkê min bizvire bêyo,
Felqek gulîyê min reş bû, yek spî bû...¹⁷*

Gelek stranên kurdî yên xerîbiyê di derbarê dilketiyên ku ji hev dûr ketine hatine gotin. Çavêن wan hertim li rê ye, diquerimin. Bi xewn û xewnerojan ve rojên xwe derbas dikin. Di van stranên kurdî de sazîke gelek balkêş heye, dema yek diçe xerîbiyê divê tiştekî wek nîşana hezkirinê bihêle, yê mayî kêfa xwe pê bîne wek derman li bal xwe biggerîne. Ev yeka ji bo yê çûyî jî derbas dibe. Li van hersê stranên jêrîn de titûn, sêv û şikil wek sê “dermanên xerîbiyê” hatine dîtinê:

*Zeriyê qurban, ez ê kêfsiz im, bêmede me
De tu rabe cixarek titûna
Qizilaxaca Muşê ji min re bîne*

*Dar û darçin, sabûna lewantê
Xudana eniya kever pê bireşîne.
Yek ji me diçe welatê xerîba, yek dimîne
Bira sebra xwe pê bîne.¹⁸*

*Zewal gede!
Diçî welatê xerîba,
Min ji bîr neke,
Min sêvek ke, xelatî ke
Berîya xwe ke,
Wexta diçî welatê xerîbiyê,
Bîna te teng dibe, derxe,
Eşqa min û xwe re qasekê lê mîzeke.¹⁹*

Di çend stranê mayîn de jî, em rastî îfada wek "memik derman in" têñ. Bi taybetî kesê ku ji dilketiya xwe dûr dikeve, diçe xerîbistanê, gelek caran bedhal dikeve, ker-gêj dibe. Keçik ji ber vî derdê dûrkentinê, bi stranekê be jî, diçe hawariya wî, di ber dilê wî de tê, dixwaze timê bîna lawikê xwe li xerîbîyê fireh bike:

Lawiko

*Dilê min li ser dilê min re kale-kale,
Îro cabek ji min re hatiye,
dibê lawikê te,
Li welatê xerîbiyê
nexwaşe, pir bedhal e.
Li welatê xerîbiyê ne balgî
ye, ne doşek, ne perpale,
Ezê ïznê ji dê bavê xwe bixwazim,
Herim welatê xerîb, xwe
jê re bikim balgî*

*Sîngê xwe bikim perpale,
Bila lawkê min bi kêf
be, êdî menale...²⁰*

Sê Malo Gundo

*Ez çûme derê çeman, çemê sar in,
Zozanê bavê te bilind in,
Berf û baran lê dibarin.
Îsal sala hefta ye,
Berî lawkê min ketiye,
Welatê xerîb û gurbetê,
Sîngê û berê min fadilê!
Bê mihas û bê tîmar in.
Yar, yar, yar xopano gundo!...²¹*

Di stranên xerîbiyê de şadî, dilşahî û kêfxwaşıya here mezin bêguman, mizginîya hatina "hezkiriyêñ çûyî" ye.

*...Min sonda mezin xwariye
Heçî saloxekî ji delal
malê ji min re bîne
Ezê bidim heft aşê mala
bavê xwe rebenê
Li ber çemê Nisêbînê.²²*

Dema yek mizginîya hatinê ji yê mayî re bîne, yê mayî amade ye ku her tiştê xwe pêşkêş bike ji bo wê xebera xweş. Ew kes amade ye canê xwe jî bide:

*Eger gava yek mizginîya
delalîkê min
Ji welatê xerîb û gurbetîstanê
ji min re bîne*

Bila qasidê Qoce Felekê, Hezretî
Ezraîl îro werê ruhê min bistîne.²³

Welatên dereke û biyanî her çiqas xweş dibin bila bibin jî, çawa di stranên kurdî yênen xerîbiyê de jî tê xuyan, welatê mirovan li ber dilê hemwelatiyênen xwe hertim şirîntir e. Mirov li welatê xerîb hertim bêhiş, bêmade û melûl e. Mirovên ku diçine xerîbiyê, wek qulingênu ji refênu xwe diqetin, wek wan bi serê xwe tenê bêgav û bêçare dimînin. Dengbêjê kurd, Evdalê Zeynikê ku pisporê qulingan bûye û bi wan re peyivîye, wiha dibêje: "...Quling hertim cot-cot in û ew hertim bi hevra diqîngînin. Qîrîna qulingekî bi serê xwe tenê elametê xêrê nîne, yeqîn tiştek hatiye serê wî".²⁴ Mirov jî wisa ye, dema ji koma xwe, refênu xwe û berdilkênu xwe diqete hertim ker û gêj e:

Hayê li min

...
Heyla dilo, tu bi şevê-royê
diqîrî, çima qe nawestî
Mînanî qulingê Serhedê ji
refênu xwe qetyayî
Serê baskê te bi çamûr, koka baskê te şkestî
Ezê îro dikim herim zozanê
mala bavê muhuba xwe,
Gelî gundîno ez nezan im, ez xerîb im
Nizanim zozanê mala delaliya mi
maye li kîjan alî, kîjan destî...²⁵

Motîva qulinçan û refan di strana
Lo, lo lawko de motîva teyr û çêkirina

hêlinan li xerîbiyê tîne bîra mirovan:

...

Lo, lo lawiko

Ezê teyr im, teyrê ser payîzê

Minê hêlinâ xwe çêkirîye

Welatê xerîba, li vê dûzê.²⁶

Dema yek ji xerîbiyê tê kurd wan wek teyrê xerîb dihesibînin û bi germî wan hembez dikin: "Teyrê xerîb tu ser seran, ser çavan, bi xêr û bi silamet hatî!". Hatine kesekî an jî kesekê wek dilşahîke mezin li her derê zû belav dibe. Çawa di gelek stranên kurdî jî de derbas dibe, stranbêjan gelek caran xwe wek "Xerîbê Xwedê" û "Xwerîba Xwedê" dîtine. Ev yeka tê ci maneyê? Ez bawer dikim ku di van berhemên folklorîk de stranbêj bêgav û bêçare ye û nizane ci bike, wek mekanîzmake xweparastinê, xwe spartiya Xwedê û xwastiye bibe parçekî mezinihaya Xwedê. Motîva tenêmâyînê, dûrî û xerîbiyê di van stranan de ketine zikê hev, bêgavî û bêçaretikê ifade dikin.

Mirov here kîderê bila here dîsa li welatê xwe vedigere û welatê xwe difikire, wek *kulîlka berbiro* ya ku divê rûyê xwe tertim li berbi rojê bizvirîne ya ku bê roj nikare bijî. Eger ew rojê nebînin diçilmisin wek dilên şikestî li xerîbiyê. Tu tiştek qasî *kulîlka berbiro* nikare hesreta welêt bîne zimîn. Mirov jî wisa ye, hertim rûyê xwe digurîne berbi welatê xwe wek *kulîlka berbiro* (*Helianthus*-latini, *sunflower*-îngîlîzî, *solros*-swêdî). Kurdên ku li welatên xerîb dimînin,

wek *kulîlkên berbiro* hişê wan hertim
li ser welêt e. Belê, ev e serpêhatiya
xerîbiyê, kurdên koçber, refêن qulingan,
çekirina hêlînan û *kulîlkên berbiro*.

Emê çi bikin xwe vî dilê şkestî,
Emê gula biçînin, dêkine destî,
Sibê herkesekê ser mezelê xwe bela ke,
*Gelo mezelêن xerîba maye li kî destî.*²⁷



Kulîlka berbiro

Jêrenot

* Li hinek herêman "qol felekê" jî dibêjin.

¹ Ji kasêteke ku diya min berî mirina xwe dengê xwe dabûyê.

² Viktor Rydberg, Dikter, 1923, rûp.127.

³ Heciyê Cindi, Klamêd Cmaeta Kurdaye lîrîkiyê, Erevan, rûp.200.

⁴ Angorî ifadeya Arif Zêrevan ku ji Şîrnaxê ye.

⁵ Berbang, hejmar 4/1982.

⁶ Berbang, hejmar 4/1985.

⁷ Ordîxanê Celîl & Celîlê Celîl, Zargotina Kurda, cild I, rûp.497.

⁸ Ordîxanê Celîl, Stranê Zargotina Kurdaye Tarîqîê, Erevan, 1975, rûp.221.

⁹ Ordîxanê Celîl, Stranê Zargotina Kurdaye Tarîqîê, Erevan, rûp.223.

¹⁰ Zehra Ayman, Bellek Mekan Olarak Sinir ve Ötekilik; Kars Şehri. İstanbul Bilgi Üniversitesi, Sosyal Bilimler Enstitüsü. Kültürel İncelemeler Yüksek Lisans Programı, 2005.

¹¹ Hraçya Koçar, Özlem, Zêl Yayınları, 1999.

¹² Ji Radyoya Rewanê.

¹³ Ordîxanê Celîl, Stranê Zargotina Kurdaye Tarîqîê, Erevan, rûp.234.

¹⁴ Nuh Ateş, İç Anadolu Kürtleri, rûp.106.

¹⁵ Ji kasêta Remziyê Kurd (Ji kurdên Anatoliya Navîn)

¹⁶ Ji Meraşê Xeberek Hat, berevkar: Alî Alxasî, Weşanên Pêrî, 2003, rûp.120.

¹⁷ Peyva felq li Serhedê li şuna nîvî tê bi kar anîn. Heciyê Cindî,

Klamêd Cmaeta Kurdaye lîrîkiyê, Erevan, rûp.33.

¹⁸ Ordîxanê Celîl & Celîlê Celîl, Zargotina Kurda, cild I, Moskova, 1978, rûp.332.

¹⁹ Heciyê Cindî, Klamêd Cmaeta Kurdaye lîrîkiyê, Erevan, 1972, rûp.29.

²⁰ Heciyê Cindî, ?

²¹ Heciyê Cindî, Klamêd Cimaeta Kurdaye Lîrîkiyê, Erivan, 1972, s.108

²² Cîgerxwîn, Folklorâ Kurdî, 1988, rûp.133.

²³ Ji kasetê Şakiro

²⁴ Ahmet Aras, Evdalê Zeynikê, Weşanên Deng, 1996, rûp.120

²⁵ Ahmet Aras, Evdalê Zeynikê, Weşanên Deng, 1996, rûp.41.

²⁶ Heciyê Cindî, Klamêd Cimaeta Kurdaye Lîrîkiyê, rûp.94.

²⁷ Ordîxanê Celîl & Celîlê Celîl, Zargotina Kurda, cild I, 501.

TESÎRA BARKIRİNÊ LI SER ZİMANÊ KURDÊN ANATOLİYA NAVÎN

-||-

Çend trend û tespît

Mîna ku min gotibû, barkirina bajaran û welatêن Ewrupayê hîn dewam dike û kes nizane ew ê çiqas bajo. Pêşî li vê barkirinê birîn yan jî bi şûnda vegerîna barkiriyan di şertêن îro da mimkun xuya nake. Pevajoyeke gerdûnî ye, meriv li her derê dînyê raste barkiriya ji gundan ber bi bajaran û ji welatêن xizan û paşvamayî ber bi yên qelaw (dewlemend) û pêşvaçûyî tê. Lê encama barkirinê li her derî ne mîna hev e. Li ba civatêن wekî kurdêن Anatoliyê, barkirin dikare bi xwe ra, jihev dûrkentin, belavbûnê û wendabûna zimên û kultur bîne.

Meriv dikare li ser rewşa zimên li ba kurdêن Anatoliya Navîn di bin şertêن barkirin û guheriyêن bingehî weki rabûna mijûlîyêن klasîk wekî pez xwedîkirin û helweşîna jîyana li gorê qeydeyên eşîrtîyê da, van trend û tespîtêن li jêr binav bike :

- Herçiqas piraniya kurdêن Anatoliya Navîn li gund û malêن xwe bi kurdî deng kin jî, berê zimanê kurdî li ba wan ber bi bîrbûn û wendabûnê ye. Her ku dihere, zêde tirkî dikeve nav kurdiya wan, kurdiya wan xizan û bîr dibe.

- Hejmara kurdêن ku bi kurdî qet nizanin yan kêm dizanin yan jî nîvziman in (fehm dîkin lê deng nakin) her dihere

zêde dibe. Wer xuya dike ku va trenda ê bileztil bibe.

- Berê tune bûn, niha va bû deh sal ku hen xwanda û ronakbîrêن kurdêن Anatoliya Navîn bi piranî li welatêن Ewrupayê destpê xwandin û nivîsandina kurdî kirine. Derketina kovara Bîrnebûnê deh sala di ber vê, di vir da roleke sereke lîst û dilize. Mixabin va trendeke piçûk e.
- Tirkî ji bo piranîya Kurdêن Anatoliyê, meriv dikare idia bike, êdî ne zimanekî biyanî ye. Tirkî li ba wan bûye zimanê duyemîn yê dengkirinê. Ji hêla xwandin û nivîsandinê tirkîya wan di ser kurdiyê ra ye.

Gerek e ci bê kirin?

Nivşen berî me li Anatoliyê ji bo parastina zimên serê xwe neêşandine û tu hewldanêن bi zanetî ne kirine. Li dewra wan parastina zimên wekî min li jor jî gotibû, di saya awayê jîyana wê demê da mimkun bûye. Lê îro, ji ber sebebêن ku têن zanîn parastin û çêtirkirina zimanê kurdi bi vî awayî ne mimkun e. Loma hînbûna(fêrbûna) kurdî bi awayekî resmî di mektewan da şert e. Gerek e ku her kesê ku qedrê didê zimanê makî ji bo vê dengê xwe derxe û bibe xwedîyê kar û xabatan. Wekî din, hewldanêن bizanetî, dezgeh û saziyêن zimanparestin û hînbûn gerek in. Heqe xwe ew e, ku li her

gund û quesabêñ kurd li Anatolîyê sazîyêñ sîvîl û civatî ên ku parastin û biberxistina zimêñ jî ji xwe ra kirine amanceke sereke hebin. Lê mixabin ji xêyîr çend istisna hîn sazîyêñ bi vî rengî tunin. Tunebûna wan yan jî biderengketina wan kêmanî û eybeke reşegiran e.Yên heyî jî rasterast qedreke bilind nadin zimêñ.

Piranîya sazîyêñ kurdêñ Anatolîya Navîn ji alîyê kurdêñ barkirî welatêñ Ewrupayê di van salêñ dawîyê da hatine çêkirin.

Gölyazi-Sağlık Köyü Yardımlaşma ve Dayanışma Birliği (Göl-Sağ) li Swîsrê, Karawitt- Karacadag-Witten Dost Şehir Merkezi li Elmanyê, Komfon- Karacadağ Yardımlaşma Fonu li Hollande, Ekeçik Kültür Derneği li Hollande, Hisarlilar Derneği li Danîmarka, Arşincililar Derneği li Hollanda, Şereflliler Sosyal Yardımlaşma ve Dayanışma Derneği (Ser-Der) li Danîmarka, Yurtdışında Yaşıyan Zincirlilikuyulular Derneği li Elmany, Gördoğlular Kültür Derneği li Swêd, CAYVAK-Avrupada Yaşıyan Yeşilyurt Köylüleri Kalkındırma ve Geliştirme Derneği, Celîka-Kırkpınar Avrupa Komiteleri, Altılar Vakfı li Danîmarka, Kuşca Cenaze Fonu li Danîmarka, Tavlıören Derneği li Elmania, Çöl Köyleri(Kırşehir) Derneği Awısturya.....

Ji xêynî van komela û weqifana pir sîteyêñ bi navê gund û qesebayêñ kurdêñ Anatolîyê jî hene. Sazîyêñ wekî Bîrnebûn, Veger, Weqifa Kurdêñ Anatolîyê(Swêd) û Komeleya ZİMAN jê derxe, meriv dikare sazîyêñ kurdêñ Anatolîyê wekî sazîyêñ gund û qesabeyêñ kurd ên li Anatolîyê bi nav bike. Hemgundiyyêñ her gundekî ên li Ewrupa hatina ba hev û li ser navê gundê

xwe komele û Weqif çêkirine. Armancêñ van sazîyêñ bi kurtî ev in:

Alikariya projeyêñ sosyal û kesêñ medxûr li gundê xwe kirin, Paraztin û jîyandina kultura gund û cîwarêñ xwe yêñ li Anatolîya Navîn, Çêkirina şev û şahîyêñ kulturî ji bo giheştina van armancan û ji bo hevdîtinêñ hemgundiyyêñ xwe.

Îsal, tenê li Ewrupayê ji serê salê vir da, bi destê sazîyêñ kurdêñ Anatolîyê heş şahîyêñ kulturî li pêy hev hatin çêkirin û têda tevhev pênc, şeş hezar kes hatin ba hev; bihevdîtin û libahevbûnê şabûn û kultura xwe dan jîyandin û bi zimanê xwe dan û standin.

Sazîyêñ kurdêñ Anatolîyê hîn teze ne. Pirê wana di nav van sê, çar salêñ dawî da hatine çêkirin. Mîna ku tê gotin, ew ê di vî karî da hîn xam in. Yêñ ku di nav da ne pê zor û zehmetîyêñ çêkirin û birêkirina komelan dizanin. Loma di despêkê da, tênegihêstî û kêmanîyê miheqaq hebin. Gerek e meriv destek bide kesê ku serî vî karî dikşînin û xwe dana ber kar û barêñ civatî malava bike û bi rexne û lomeyêñ tûj wan eciz nekin.

Ji hêla zimêñ da kêmanîya sazîyêñ kurdêñ Anatolîyê liberçav ew e ku ew zêde qedr û qîymetê nadin zimanê makî. Heqê xwe ew e ku sazîyêñ kurdêñ Anatolîyê Navêñ kurdîjîli xwe kin û kurdî bikin zimanê navxweyî ê têgihandinê û hewl bidin ku endamêñ xwe xwandin û nivîsandina kurdî jî hîn bikin.

Ji bo hevnaşîn û hevkarîya di navbera sazîyêñ kurdêñ Anatolîyê da jî lazim e ku gavîn bêñ avêtin. Komela ZİMAN di kongreya xwe a îsal da qerar daye ku sewa vê armancê civînekê çêke û bane sazîyêñ kurdêñ Anatolîyê bike.

KOÇBER

Li dawiya çîyê
di qelşa zinarekî da
dareke şîlanê
bi tenê
li ser guliyan
çûçik û meşên hingiv
li siyê
jîndarêن hûrik

darê
xwe dabû berroj
û
xewn didît.

RÊ

Bışkok
janêن hawê gişt kişandin bi
şûn da kenî
pêl pêl pelik vekirin
mewî da
û
mir
bihar hat
darê dîsa bışkok da!

Seyfi Doğan

Roja me

Bavo
riya te dibînim
ez di riya te de dijîm
tu ji bîra min naçî
kengî gelê me
kêfxweş bû
wê ez jî xweş û geş bibim
birayê min yê biçûk
yanzdeh salî bûye
dipirse û dibêje
bavê min bi ku de çû?
ez dibêjim
ji bo nasnameya me
û mafê me
di berxwedanê de ye
kengî aştî were welatê me?
bêserhildan gelê me
azad nabe birano
egîdno
simbêl keytano
çavbelekno!

Kurdistan

Her dem
Kurdistan di dilê min de
ji bîra min nare
jiyan çiqas xweş e
li welatê min
ez dixwazim
li ser axa xwe bimirim
hezar salan gel jiyane
li ser axa şaristaniya wê
helbestvan û filozofên
wek Ehmedê Xanî
Feqiyê Teyran
û Cigerxwînê heyran
yên bi qedr û qîmet
rûmetên me ne.

Ramazan Kesen

2004.03.21

Yenîceoba

MİRİYÊ ZİNDÎ



Di neynika dilê xwe de
li nav qermîçokên
eniya xwe
pêrgî jana xerîbiyê têm
pira hêviya min
ya li navbera berbangê
û asoyê
hilweşandin
toza bîranînên
lanetbûyî
bi kefa mistan
bi ser min de
daweşandin
mayînên bagêje
di mîjiyê min de
teqandin
nikarim
xwe ji pencên
kurtepista zimanê deyûsan
biparêzim dayê
çavşorî
hesûdî
û zikreşıya mirovên çeqel

Xizan Silan

bîr û baweriyê
li min diqurifîn
jiyanek zindî-mirî
li min siwar kirin
di jiyanâ talanbûyî
û giyanê xwe de
bû me qulingê koçeber
ji ber awirêñ şermok
hesta tawanbaryê
û evîndariyê
bêhn li min diçike
pişt li min xûz dibe
dil li min zîz dibe
di nav êş
hêrs û tirs
û bêdengiya xwe de
difetisim
wekî ku ez
ne ji te
ji zikê janê çêbûbûm
êşan
bi awirêñ zexelane
ez ji paş ve
xençer kirim
hevsarê xemgîniyê
xistin stûyê
hêviyên min
û ronahiya fanosa
pêşeroja min
li min reş kirin

dayê
ez niha
ji piyala hesretkêşan
keserkêşan
û serxweşan
hêstirêñ dilê te
vedixwim
û her roj
bi zindîbûna xwe re
dimirim
li ber dîwarêñ
kolanêñ hinavê min
yên bênavnîşan
kêlê gora min datînin

Xizan Şîlan

Stockholm

2005-06-09

Vejandina dîroka rasteqîn pirtûka Rohat Alakom

“Arîstokratên Kurd: Torin”

Nêrînên giştî

Zorbeya lêkolînên li ser dîroka Kurdistanê di nav çarçoveyên “fesal” de dimînin, ango râberzinên wan li ser bûyer, kesayetî û rewşa siyasi ne. Ev nêzîkbûna teng bersiva pirsa sereke nade: Kijan bingehêن dîrokî ji hebûna dirêjxayan ya kurdan re bûne misoger? Bê ku dîroka kûr ya Kurdistanê vekolînin, siyasetmedarên kurd û biyanî wê der-dora çareseriya kêşeyan biçin û bêñ, wê pêşveçûnan bikin cangoriyên teoriyên giştî û wê di nav dirûşmeyên vala de armancêñ kurdan veşêrin. Mînakêñ van dirûşmeyan li ber çavan in: Biratiya kurd û tirkân, yekîtiya gelên misilman, federalîzma erdnîgarî, mafêñ kêmneteweyan, krîterên Kopenhagenê... Mixabin, ji van bêkîrtir jî hene.

Ji aliye kî ve, şaşiyêñ siyasi hene û ew şaşî ji zanîna kêm têñ. Ji aliye din ve, rûreşıya berhingaran bi mebest tiştan destepaçe û tevlihev dike. Lê ji bilî van herdu tengasiyan, îdeologiya liberalîzmê rê li ber şirovekirina berdewamiya dîrokî (bi înglîzî *continuity*)

digire. Îro ramana liberalîzmê cihê xwe di gengeşeyêñ teorî de girtiye û kartekîneke mezin li ser pêvajoya siyasi ya navneteweyî dihêle. Lewma mirov dikare hebekî li ser vê pirsê raweste.

Lîberalîzm bala xwe dide sedema pirsgirêkan (ji bo çareseriya dadmendî) û berjewendiyêñ aliyan (prensîpa ba-zara azad di siyasetê de). Aloziyeke here mezin ya nêrînên lîberal ev e, ku deriyêñ sembolik û giyanî nayêne vekirin. Di çavêñ lîberalan de, bawerî, wateyêñ çîvanokêñ gelan, peywendiya di navbera dîroka bûyî û dîroka şirovekirî de û bi giştî her tiştekî mecazî ne hêjâyî sohbetê ne. Lê belê, mînakêñ neteweyêñ curbicur dibêjine me, ku ev deriyêñ girtî dikarin nasnameya serzemanî (transtemporal) biafirînin û bibin sekoya konsepta serbestiyê. Ji ber vê yekê çêtir e, eger em di warê hêmanêñ sembolik ya Kurdewariyê de agahdartir bibin. Hizrdarêñ lîberal wan hêmanan yekcar li ber çavan nagirin. Nemaze çunke ew ji xwe ne lîberalêñ Kurd in.

Lê ramaneke xerabkar heye, ku hên berî liberalîzmê xwe di nav sedsala 20an re bera kiriye û bûye prensîpa jiyanâ navdeweletî. Û bi vî awayî jî bûye sedema kerasetê mezin. Ev raman daxwaz dike, ku çareseriya hemû pirsên nav(neteweyî) li ser bingeha qanûnan pêk be, herçend ev qanûn li gor kar û berjewendiyê desthilatdaran hatine afirandin û bi destê wan têne parastin.

Berpirsayariya dîrokñasêñ kurd

Pirsa sereke, çima kurd cemawerekî dîrokî ye, gelek tişt di nav xwe de veşartine. Eger em vê xalê bidin ser hev û berbiçav (konkret) bikin, dîrokñasêñ kurd divêt hinde tiştên bingehîn bê tirs û şerm bi qelem bikin:

- Zimanê kurdî xezîneya ferheng û rêzimanêñ hem ber-Hindo-Ewropî, hem jî yên din ji herêmê ye;

- Dîn û olêñ kurdan bi şeweyeke belî (çi erdnîgarî, çi jî li gor pergalêñ aynî) digihîjine çavkaniyêñ dînêñ cîhanî;

- Çîvanokêñ kurdan bi kêmanî herêmî ne, lê ne dûr e, ku di koka xwe de serboriya mîrovahiyê bi xwe re kaş dikin;

- Qeraçiyêñ (li hinde herêman ji wan re dibêjin «mirtiv», ji peyva «mirtib») Kurdistanê bermayıyê vê pela mezin ya koçkirina qeraçyan ji Hindistan heta Ewropayê ne. Balkêş e, ku pisporêñ qeraçyan basa 500 peyvên kurdî di zimanê wan de li Ewropayê dikin; beşek

ji wan - mîna gaziya "lê-lê" - ketiye nav zimanêñ gelên Rojhilata Ewropayê;

- Bê Cihûd - ango yahûdiyêñ Kurdistanê - wateya dîroka vî gelî kêmtir dibe;

- Rojhilatzanê mezin Vladimir Mînorsky di çavkaniyêñ serdemâ Selaheddînê Eyûbî de nîşan dide, ku hên wê demê basa kurdîtiyê – wek hestike taybetî – dihate kirin;

- Ji Şerefxanê Bedlîsî em fêr dibin, ku netewîtiya derebegî ya kurdan di sedsala 16an de wisa xurt bû, ku ev êdî çend sedsal in, ku ew kolneder e (Şerefxanê Bedlîsî).

Bi ya min be, di nivîsêñ li ser dîrokê de, xalêñ weha, yên ku berdewamiya dîrokî û xwezanîna kurdan berpa dikan, gerek e bibin armanca serpişik. Mebesta dawî ev e, kudelîveyêñ siyaset-medarêñ kurd bêne firehkîrin. Çunke - li dij cîhanbîniya lîberalan - netewe ne mîna komeke lîstokvanêñ şetrencan e û ne jî civakeke jiberxwederxistî ye (bi înglîzî imagined community).

Bingeha fikira neteweyî li dema navîn, hebûn û xwezanîna çîna arîstokratan bû. Ev çîn ne li ba hemû neteweyêñ hebû, yên ku îro bûne xwedî dewlet. Lê rista vê çîna bi reçelek di nav kurdan de belgeya kûraya dîrokbûna kurdan e. Ji ber vê yekê lêkolîna Rohat Alakom «Arîstokratêñ Kurd: Torin» hêja ye, ku ji aliyê Kurdan û xêrxwazan ve bibe sedema raberzînêñ bi nirx.

Naveroka pirtûka Rohat Alakom

Hêz û giraniya pênûsa birêz Rohat Alakom hên di vê têbîniya wî de xuya dike, gava ew karnameya xwe wek „cerbandina dîrokê“ bi nav

dike. Bi vê gotinê ve, ew rexneyên zanistî dipejirîne (berrevajî helwêsta wan rewşen-bîrên kurd, yên ku rexnegirtinê wek pelamareke li dijî namûsê mêze dikan).

Hêjayî gotinê ye, ku ev pirtûka 14mîn ya pisporê dîrok, wêje û civaka kurdan birêz Rohat Alakom e. Ev hejmara han bi serê xwe - eger em xebata wî ya giştî jî li ber çavan bigirin (gotar, konferans, danûstandinê bi awayê din) - keda Rohat Alakom ji bo kurdzaniyê eşkere dike. Her weha, ev lêkolîna teze diyar dike, ku lêkolîner metoda xebata xwe bi keresteyan gihandiye asteke profesyonel ya navneteweyî. Bi biryareke rast, birêz Alakom, ji ber taybetmendiya Kurdistanê, çavkaniyê devikî û nivîskî hevber



kirine û ew bi kûrayî şirove kirine. Her wisa wî analîzêن xwe sipartine dokûmentên osmanî û rûsî, lêkolînen kurdologên navdar mîna Vladimir Minorsky, Emînê Evdal, Elena Vasilieva, Ismail Beşikçi,

Cerkez Bakayev, Michael Chyet û gelekên din. Pirtûk bi du zimanandî di weşanxaneya Apecê de hatiye weşandin: kurdî (% 75) û tirkî (% 25). Dabeşkiri na lêkolînê bi kurdî wisa ye: **Pêşgotin; Çend Rûpel ji Dîroka Serhedê; Torin Kî ne; Komên Torinan; Mezinîn Torinan; Coxrafiya Torinan; Notên Binî (Jêder) û Al-**

bûma Torinan (digel wêneyên balkêş). Belê, Rohat Alakom bîblîografiyeke berfireh bi rêz kiriye, lê xwezil di kutasiya pirtûkê de *Index* (nîşana têgîn, nav û yekîniyêner erdnîgarî digel rûpelan) jî hebûya.

Naveroka pirtûkê zahf dewle-mend e. Her pirseke şirovekirî me nêzîkî rastiya têgihiştina dîrokê dike. Ne dûr e ku hinde dîroknas kîmasiyeke metodologî têderbixin:

Pirtûk ne tevaya pêvajoya arîstokrasiyê li Kurdistanê şirove dike û belkî bisînorkirina navê wê mîna "Arîstokratên Kurd li Serhedê" wê dirûsstir bûya. Lê ez bi xwe digel biryara birêz Alakom heşmend im, gava ew navekî weha giştî dide lêkolîna xwe. Çima? Ji rûpelên pirtûkê eşkere dibe, ku di gelek tiştan de arîstokratên Serhedê rêberên seranserî Kurdistanê bûn:

„Bi kurtî mirov dikare bêje ku di nav kurdên hemû Kurdistanê de, kurdên ku cara pêşîn nasiya xwe dane çanda Ewrûpayê... û bûne nîv-ewrûpayî ev tebeqeya torinan bû. Mirov dikare mezinên Torina Serhedê bi *Kurdên Ewrûpayî* bi nav bike... Wan zarokên xwe li Rûsyayê dane xwendinê, zarokên wan hînî rûsî û zimanên mayin bûne. Piraniya mezinên torinan bi zanebûn û kiryarên xwe ve navdar bûne. Vê navçê li ser prosesa *medenîbûna* (sîvîlbûna) kurdan bandoreke mezin hiştiye" (rûpelên 35-36).

Bi saya vê lêkolîna mijara basê, emê jî bizanibin, ku herêma Serhedê – bi nav û fûnksiyona xwe ve - xwediya berdewamiya dîrokî ye. Em bala xwe bidine çar vedîtinên birêz Alakom yên bi çerxên cure-cure ve girêdayî:

„Destana bîzansî ya bi navê *Digenis Basileios Akritas* di derbarê mîrekî sînorparêz de hatiye nivîsin... Ev kesekî bavmisilman bûye. Diya

wî jî jineke yûnanî bûye... Çawa tê zanîn li derdorê sînoran hertim çandên cihê hebûne... di nav hev de çandên nû, yên têkel (tevlihevbûyî) pêk dianîn... Vê yekê bi salan û bi sedsalan ajotiye û bandora xwe ser çanda kurdan jî hiştiye. Çandeke têkil li Serhedê pêk hatiye" (rûpelên 16-17).

„Leşkerên kurd carina li Serhedê ji bo parastin û hin caran jî ji bo firehkirina sînorên osmanî, ûrânî û rûsî xwe di nav gelek şeran de dîtine. Wan wek leşkerên sînoran şer kirine. Ji wan re bi latînî *milites limitanei* û bi tirkiya osmanî *serhad kulu* hatiye gotin. Peyva *serhad* wek peyveke dîrokî ji bo deverên Qers, Agirî, Wan û Muşê hatiye bi kar anîn" (rûpelên 17-18).

„Dema mirov wan peyvên ku ji rûsî ketine zimanê kurdiya vê navçê berçav dike, mirov dibîne ku ev peyv di wan salan de nîşana malhebûnê, kêfxweşiyê, rehetiyê û arîstokrasiyê bûne... peyvên rûsî cara pêşîn saya tebeqeya Torinan ketine nav kurdiya vê deverê. Ev babeta weke babeteke sosyolojiya zimên gelek bala mirov dikişîne" (rûpela 36).

„Di dokumanekê de (Nîzam-nameya Îdara Eşîrên Kurd) çawa diyar dibe, Rûsyayê xwastiye nîv-otonomîkê bide van eşîrên kurd yên ku di nav sînorên wan de diman" (rûpela 41).

Her weha, Rohat Alakom çîvan-okeke di derheqa Siltan Silêmanê Osmanî de jî bi qelem dike, ya ku rista bêhempa ya sînorvanêñ kurd nîşan dide.

Bi dû re, lêkolîner bibîranîna kurdan ji hêla Marx û Engels ve jî dixe nav pirtûkê. Ev belgeyeke baş e - ji ber ku dîrkozanî ye û li derveyî mercên îdeologî dimîne.

Ji ber babeta pirtûkê etîmologiya (dîroka peyva) *torin* jî bala xwendevanan dikişîne. Belê, çînayetiya arîstokrat di nav kurdan de weha zen-gîn û rengîn bû, ku di zimanê me de gelek têgînêñ ji bo arîstokratan hene. Ji xwe birêz Alakom vê yekê bi nimûneyên Serhedê dixe nav pirtûkê (ji rûpela 30an de u wê de). Belê, eger em agahiyêñ lêkolîner serzêde bike, ew dibe mijareke bê serûbin: Navêñ giştî (mîna dûzmanza, *asîlzade*, (bi) *reçelek* û *cindî*), peyvîn berbiçav (wek *axa* û *beg*) û tevaya hiyerarşıya desthilatdaran ji rojgara kevinare domandî (şah, padişah, *mîr* û heta dawiyê).

Li gor şirovekirina birêz Rohat Alakom (rûpelên 21-24an), gotina torin bi koka xwe digihîje toximê rind. Lê ya here giring ev e, ku birêz Alakom – wek dilsozê zanistê – vê peyvê digel têgînêñ hemwate ji zimanêñ Hindo-Ewropî (yûnanî, fransî, almanî, swêdî û yên din) hevber dike. Ew ronahiyê diavêje ser tiştê ku di zimanziyê de wek

"kategoriyêñ veşartî" (bi înglîzî convert categories) tê nasîn. Kategoriya veşartî hizra li piş peyvê dide xanê (mînakeke sade: Baran û barîn, ango baran tiştê e, ku dibare – di hinde zimanêñ din de jî wisa ye).

Bê guman, mirov dikare du-sê têbîniyêñ birêz Alakom tije jî bike. Wek mînak, peyva *berek* (klan) li ser rûpela 24an û wê de, ku bi rastî wan kesan nigar dike, yên ku ji bavekî hatine. Ez di vê baweriyê de me, ku ew ji peyva aramî (samî) - *bar* - hatiye. Eger wisa be, *bar* ketibe nav zimanê kurdî. Belkî mirov dikare têke bîra xwe, ku kurdologê hêja Oleg Vilchevsky digot, ku di navbera zimanê kurdî û zimanê aramî de pêywendiyeke "întîm" heye. Wisa, di nav yahûdî û asûrî-kildanî-sûriyanîyan de jî êpêce navêñ klanan û paşnav bi *bar* destpê dîbin. Wateya peyva *bar* jî zelal e - kur, law. Balkêş e, ku eger piraniya navêñ komên kurdan (*qebîle*, *hozî*, eşîr) ji erdnîgariyê têñ, navê berekan hem dikare bibe nişana navçeyekê, hem jî dikare bighîje mirovekî.

Bi ser de, minê hîpotezeke din jî (ango fikireke bê belgeyên hişk) pêşkêş bikira. Navê Silîva li ser rûpela 27an bi qelemkirî jî belkî bi koka xwe digihîje Selîbî, ango Xaçparêzan. Ne dûr e, ku wate ew xaçparêz bûn, yên ku di vir re derbas dibûn û diçûne xaka pîroz, li dijî misilmanan şer bikin. Lewma ne behetî ye,

ku gava hinde ermeniyêن Binxetê basa destana Xecê û Siyabendê Silîvî dikan, ew kurdan wek biraziyêن xwe bi nav dikan (ango Siyabend mirovekî Selîbî-Xaçaprêz bû).

Ez jî mîna birêz Alakom dudil im, gava dixwînim, ku hemû arîstokratên kurd li Serhedê ji herêmên din hatine. Beşeke wan belkî ji herêmên kurdan yên din hatibin, çunke çûn-hatin di dîrokê de rewa ye. Lê divêt bê zanîn, ku li gor Minorsky û pisporê din, zorbeya arôstokrasiya Kafkasê – Gircistan, Ermenîstan û Azerbeycana îroyîn – bi kêmanî di sedsalêن 8-13an de bi koka xwe Kurd bûn. Carinan ew di nav gelên din de - çawa jiyana arîstokratan vê yekê dixwaze – dibuhujîn (dihe-liyan), lê pirê caran kurdbûna wan diyar e. Lewma rewş berevajî xuya dike: Arîstokratên kurd li Serhedê beşeke mayî ji vê çîna mezin bû, ya ku di nav sal-zemanan re serperêştiya civakên ermenî, gurcî, faris û tirkên azerî hildabû ser milên xwe. Em dûr neçin û bi tenê bibêjin, ku kurdbûna zorbeya arîstokratên gelên Kafkasê hêن di çavkaniyêن kevinare de (ji hêla Ibn Xellîna ve û di çîvanokên ermeniyan de) dihate eşkerekirin. Rista binemaliyêن kurd – mîna Bagratî, Şeddadî, Merwanî, Rewadî û pêşiyêن Sefewiyan - di dîroka herêmê baş tê zanîn û pejîrandin.

Hêjayî gotinê ye, ku taybetmen-diyeke çîna arîstokratên kurd li vê herêmê ev bû, ku ew bawermendên dîn û olên cewaz bûn, herçend carinan ji malbatekê jî derketibûna. Ji bona têkiliyêن di navbera malbatên arîstokratên kurd de û ji bona pîrsa desthilatdariyê, dîn nedibû asteng. Vê kevneşopiya hewas toleransa torinên kurd li himber çandêن din xurt dikir. Heta Vladimir Minorsky, bingeha dilronî, comerdî û mirov-heziya Selaheddînê Eyûbî li cem pêşiyêن wî li Kafkasê didît. Lê di dawiya sedsala 19an û destpêka sed-sala 20an de rewş hate guhartin û bi tenê arîstokratên kurd yên sunnî û Êzdî li herêma Serhedê mabûn. Birêz Alakom digihîje vî encamî:

„Çawa tê zanîn kurdên êzdî ji ber bawerî û dîtinêن xwe yên oldarî gelek ezîyet, tade û lêdan dîtine. Ji wan pir malbat ji ber vê zilmê revîne, xwe avîtine ber bextê Rûsyayê û li wir cîwar bûne. Dema mirov li rewşa van salan dinêre, mirov dibîne ku di navbera rûsan, ermenî, kurdên êzdî û Torinan de hevgirtinek pêk hatiye. Angorî rûsan vê yekê kurd ji fanaîzma dînî bi dûr dixist“ (rûpela 60).

Bi hevokeke gelempêri mirov dikare bibêje, ku têkstêن devikî, belawbûna torinên Serhedê û agahiyêن li ser binemaliyêن dûzmanza - ev gişk xalêن serkevtî yên pirtûka Rohat Alakom in.

Hinde serinc û amojgarî

Berî her tiştî, zimanê birêz Alakom li ser asteke bilind ya zanistî ye. Hevokên xweşik, zelal û babetî (ne zêde dirêj – ne jî pir sade û kurt) barê xwendevanan sivik dikan. Yanê ev pirtûk bi xwe dibe belgeya vê yekê, ku iro bi kurmanciya Jorîn lêkolînên dîrokî yên hemdem dikarin bêne avakirin, weşandin û xwendin. Lê belê, li vir jî di kêm cihan de qisûr û kêmanî hene: Yan tîpa "ş" diyar nake (bê guman, ev şâşıya çapê ye), yan ergatîv ne bi rêk û pêk e, yan jî dewsa têgînên nûjen peyvîn tirkî-erebî têne xebitandin. Ji bilî van tiştan, daxwazeke giştî (ji hemû rewşenbîr û zimanzanên kurd) ev e, ku di kurmanciya jorîn de qanûneke xişplane bê pejriandin: Bila navên biyanî (madem alfabetâ me latînî ye) bi cureya xwe ya ôríginal bêne nivîsin. Li vir em dikarin çav bidin zimanên din yên Hindo-Ewropî (beî her tiştî înglîzî, fransî, almanî, ispanî û italî) û navên biyanî wek xwe binivîsin (mînaka here diyar: Marx – ne Marks).

Serinca duyemîn jî ev e, ku wê gelek baş be, eger di dawiya lêkolînên dîrok-nasên kurd de kurteencamek (*summary*) bi înglîzî yan fransî bê amadekirin. Me divêt-nevêt, iro înglîzî û fransî bûne zimanên sereke ji bo lêkolînên humanîter. Bê guman, ji bona bandora praktîk li ser kurdan û pisporêñ tirk, beşa tirkî di pirtûka *torin* de gelek di cih de ye. Nemaze ji ber ku mijarêñ li ser herêma Serhedê û dîrokbûna kurdan derewên dagîrkeran eşkere dikan. Lê bila li ber çav bê girtin, ku iro % 83 jî weşanên duniyayê bi înglîzî ne. Eger naveroka pirtûkên wisa hema li ser du-sê rûpeylan bi înglîzî jî bê amadekirin, emê hemû dîroknaşen xwedî nav û deng, hemû xwendevanên balkêşdar ji xwe re qazanc bikin.

Bi vê pirtûka "*Arîstokratên Kurd: Torin*" ve birêz Rohat Alakom gaveke pîroz avêt, ji bo ku em bi xwe, ji bona xwe û li ser asta hemdem û zanistî rabirdûya xwe binasin. Bangewaziya filosofê navdar jî ev bû: „*Pêşî xwe binase*“.

„AĞITLAMA- ŞİİR“ İN SESİ BEJAN MATUR’LA KONUŞMA

Sevgili Bejan, öncelikle belirteyim ki, bu konuşturma bugüne kadar seninle yapılanlardan biraz farklı olacak. Çünkü, şiirinin bütüncül bir irdelemesinden çok, içinden geldiğin Orta İctoroslar'daki Alevi Kürt toplumuyla şiirinin bağı ve bu bölgenin özgül koşulları üzerinde yoğunlaşmak istiyorum.

– Herşeyden önce şunu sormak istiyorum. Yalnız şiirlerinde değil, yazılarında da tam bir imgesel-şıirsel anlatım kuruyorsun. Bunu neye bağlıyorsun, başka bir deyişle bunun sırrını açıklar mısın?

– Öncelikle ben bir şairim. Şiir büyük bir kıskançılıkla hayatimdaki yerini korumaya, biricik olmaya uğraşıyor. Böyle olunca meylettığım diğer tüm uğraşlara şiirin derin gölglesi düşüyor. Gazetedeki yazılarında bana has bir söyleyişten sözedyorsanız eğer, bu tasarlannmış, karar alınmış bir uslup arayışından değil, baktığım dünyayı o kelimelerle algılıyor olmamdan kaynaklıyor. Yani yazılarımı konu olan dünyaya ve o dünyanın hikayele-

rine baktığında öyle görüyorum. Ve tabii bir gazeteci yahut sosyal bilimci olmadığıma göre yazılarında şiirin etkisinin görülmemesini doğru da buluyorum.

– Toplumsal ortamla sanatçı, sanatçıyla sanat ürünü arasında bir diyalektik birlik ve kanbağı bulunduğuunu biliyoruz. Nitekim sende de farklı bir coğrafya, farklı bir mekân, farklı bir aidiyet; dolayısıyla farklı bir uslup ve farklı bir söyleyiş özelliği var. Şiirlerinde hem yöre halkın burukluğunu, hem de Kürt kılamlarının rayhasını tadar gibi oluyoruz. Bunu nasıl açıklarsın?

– „Burukluk“ dediğiniz şey aslında varlığa içkin bir durum. Bu anlamda gündelik siyasetin dilinden uzaklaşıp insana felsefi düzlemde baktığınızda onun varlığına içkin bir yalnızlık, hüzün görürsünüz. Dinlerin, felsefeyin derinde aradığını, psikolojinin ontolojik bağla açıkladığını, siyaset toplumların hayatıyla sınırlayarak anlamaya çalışır. Aslında soru aynıdır.

„neden varım?“ Doğduğum topraklara ve o topraklarda varolan topluluklara baktığında hep köklerle ilgili sorular belirir zihnimde. Bu soruların kaynağını nerede aradığınızla ilgili olarak üzününüz de artıyor yahut azalıyor. Şiirimde yer eden „kavim“ duygusundan söz ederken taşan üzüm biraz da bu söylemeklerimle ilgili olarak düşünülmeli.

– Biraz daha açacak olursam, senin şii-rini biraz ağıtlama- türkü'lere benzeti-yorum. Şiirinde bu düşünsel ve duyu-gusal dokuyu oluşturan nedir sence?


– Bir şair dile ve dilin seslerine en üst düzeyde duyarlı bir varlık olarak içine doğduğu dünyanın seslerine, o seslerin toplamını oluşturan folklor'a yabancı kalamaz. Adına sembol repertuarı dediğimiz bu birkimin şire yansımıası kaçınılmaz. Şunu söyleyebilirim: folklor malzemesinin dönüşmesi, dilin içinde eriterek yok olması ve dile tadını, cinini katması anlamında önemli. Bu nedenle Folklor'a açık göndermeler yapmıyor, bundan bilerek kaçınıyorum. Diğer yandan çocukluk yaşantılarının bilincimde birkirliği atmosfer bir biçimde dizelerime siziyor. Edebiyatta özgünlüğün „bir yer duygusunu“ okura geçirebilmekten kaynaklandığını düşünürüm hep.

– Alevi/Kürt kökenli bir şair olduğunu biliyorum, zaten sen de yeri geldikçe bunu vurguluyorsun.

Bu „azılık içinde azılık“ kimliği nasıl etkiledi seni?

– Yazı insanın kendisine dışarıdan bakmasının bir aracı olduğuna göre, bir yazar için, bu kadar çeşitli kökler barındıran bir kimlik yapısı avantaj olabilir. Kimliğiniz doğallıkla sizi merkezin dışında tutan öğelerden kuruluysa aidiyete ait sorular -ki yazının en temel konusudur- kendiliğinde kapınızda belirir. Sahte aidiyetlere hevesli biri için dahi böylesi bir kimlik yapısı onu gerçeklik, samimiyet zeminine çeker. Sigorta görevi görür. Böylesi bir sigortayı ben gerçeklik arayışında olmasını hayal ettiğim edebiyat için son derece önemli buluyorum. Günümüzde pek çok yazarın biografisine baktığınızda çeşitli etnik kimliklerden oluşan bir kolaj görürsünüz. Yani yazısına kaynaklık edecek, edebiyatını besleyecek bir kök arayışında herkes! Kök galiba sahtesi en çok sırtan, şu hayat-taki en önemli şey!

– Bir konuşmada; literatürde Orta İç- Toroslar olarak nitelendirilen Maraş bölgesinde yaşayan farklı etnik toplulukların gerçekte hiç bir zaman tam olarak kaynaşmadıklarını, dahası adeta bir yama gibi durduklarını ve birbirlerini birer „yabancı“ gibi gördüklerini söylüyor. İlginç bir gözlem bu. Buna ilişkin düşüncelerini biraz daha temellendirebilir misin?



Bejan Matur

– Maraş Türkiye`deki çoğu yer gibi çeşitli farklı gurupların yan yana karışmadan yaşadığı bir şehir. Tarihsel birkimi etnik köken anlamında Türk, Alevi-Kürt ve Ermenilerden oluşuyordu. Ermenilerin tehçir edilmesiyle bölgeye yerleştirilen en önemli iki gurubu kafkasya kökenli Çerkes ve Çeçenler, Balkan kökenli adına „muhacir“ dediğimiz topluluklar oluşturmuyor. Birbirlerine karışmadıkları doğru, fakat bu sadece Maraş'a özgü bir durum mu emin değilim. Türkiyenin pek çok yerinde bu böyle. Diğer yandan Maraş'taki Alevi-Sünni karşılığını bugün dahi belirleyen tarihsel neden söyle yorumlanabilir:

Şah İsmail-Yavuz Selim karşılaşması. Yani Dulkadir oğulları beyliğinin yönetiminde Türk yoğunluklu Maraş'a Şah İsmail'in ordusuyla yürümesi o bölgede yarı göçebe halde yaşayan kürt alevi aşiretlerine bir bilinc kazandırıyor. Bugün hala o bölgede benimde aralarında büyündüğüm aşiretlerde bir İran şii etkisi görülmüyor. Alevi deyişlerinin çoğunda şiir teolojisinin izleri sürülebilir. Bu keskin ayrimın etkileri bugün de alevilerin sünnilere karşısındaki konumunu belirliyor.

– Sanatta ve kültürde yöreselden ulusal, oradan evrensele giden bir çizgi bulunduğu açık. Buna

rağmen, geçmişte mahalli kültürün önemi yeterince algılanmıyor, dahası küçümseniyor. Simdilerde bu konuda bir açılım sözkonusu. Senin bu konudaki düşüncelerini öğrenebilir miyim?

– Yerel Evrensel tartışmasından uzun bir dönem entellektüel hayatımı belirleyen „batılılaşma“ perspektifi oldu. Yani tanımlanmış yerleşik bir batı karşısında ona benzediğini daha fazla kanıtlayabilmek için ona ait değerler evrenselmiş gibi algılayan bir doğu. Halbuki gelenekle doğru bir ilişki kurmanın, geleneği yeniden üretmenin de mümkün olabileceğinin işaretlerini veriyor sözünü ettiğiniz durum.

Modernleşme sorunu salt bir modelde dayanarak onun değerleri üst ve everenselmiş gibi algılayarak yaşandığında boşlukları da beraberinde getiriyor. Halbuki „aslında ne olduğunu“dan hareketle yola çıkarsan yolunun başlangıcında duran mahalli kültür bir zenginlik, bir hazine olarak kendisini açıyor size. Diğer yandan çağdaş sanat tanımı gereği folklorдан ibaret kalamayacağına göre: Yerel malzemeyle ne yapacağımız onu nasıl bir üst aşamaya taşıyacağımız konusunda yöntem arayışlarına sınır konamamalı diye düşünüyorum.

ANKARALI KÜRT CEMALİ'YE AĞIT

Bîrnebûn Dergisi'nin 25. sayısında Ankaralı erdemli kabadayı Kürt Cemali'nin acılı yaşamını, Haldun Taner'in *Keşanlı Ali Destamı*'ndan giderek irdelemiş ve „*Keşanlı Ali Mi, Kürt Cemali Mi?*“ sorusunu ortaya atmıştı. Çünkü H. Taner'in sözkonusu tiyatro eserinde anlatılanın tümünün, Ankaralı Kürt Cemali'nin yaşamı olduğunu tanıklarıyla göstermişti.

Sözkonusu yazımızı okuyan **Serdar Uçar**, ölümünden sonra Kürt Cemali üstüne yakılıp, Urfalı ünlü Kürt sanatçı **Nuri Sesigüzel** tarafından 45'lik plağa okunan aşağıdaki ağıtı bize gönderme inceliğini gösterdi. Sözkonusu ağıtin söz ve müziği **A. Nail Bayuşu**'ya ait. Önceki yazımıza bir ek olarak bu ağıtı da vermeyi uygun buluyoruz.

Ankaralı Kürt Cemali'ye Ağıt

*Kaderin böyleymiş ağlama ana
Cemal'in belendi al-kızıl kana
Dört tane yavrumu bıraktım sana
Layık midir felek, bu ölüm bana*

*Ben ölürsem bağlatmayın başımı
Arkadaşlar diksin mezar taşımı
Annem silsin gözlerimin yaşını
Dertli yazın mezarımın taşını.*

RESSAM FİLİZ ATEŞ İLE SÖYLEŞİ



Konya ilinin, Kulu ilçesine bağlı Karacadağ Kasabasında beş çocuklu çiftçi bir ailenin 4. çocuğu, ilk, orta ve liseyi yine aynı kasabada bitirdi. Isparta Süleyman Demirel Üniversitesi Güzel Sanatlar Fakültesi Resim bölümünden başarılı bir dereceyle mezun oldu.

Üniversitedeyken birçok karma resim sergisine başarılı öğrencilerin yer aldığı sergilere fakültenin seramik bölümündeki özel projelerle, Isparta'nın Aksu ilçesinde kültür bakanlığı bünyesinde başlatılan arkeolojik kazı çalışmalarında görev ve yer aldı. 1,5 yıl Konya-Kulu'da vekil öğretmenlik yaptı. Bu arada Düden Gölü Festivali bünyesinde Kulu'da 2 kişisel sergi açtı. Yine 1,5 yıldır özel atölyesinde resim çalışmalarına devam etmektedir.



Filiz Hanım klasik bir soru: Resim nedir? Ressam kimdir?

– Resim hayatın çerçevesidir. Ressam ise çerçevesiz hayata ruh verendir.

Küçük bir kasabada yetişmene rağmen başlangıç nasıl oldu, nelerden etkilendin?

– Başlangıç ilk olmanın ilgincliği kadar ilginçti. Çocuk yaşıta, duygularımın karşısındaki insana eylelebile tutuşmadan yoksun, ortak tekbir noktaları olmayan, ayrılmak için bir araya gelmiş ve yine aynı şekilde benim aldığım bir kararla bitiveren bir akraba evliliği. Ardından yaşanan durumun maddi değil manevi bedelinin ağır olacağı bir

sürec, formalite evliliğin hiç olmamış bir versiyonu gibi. Ki toplumun böyle bir karar, insana bakış açısı ayrı bir tartışma konusu. Başlangıcı sağlayan bu bedeli ödememeye direnişti, nedeniye hiçbir şey yaşanmamasına karşılık manevi bir çöküş olmadı bende, ailem bütünüyle destekledi kararımı ve yol başladı. Selda arkadaşımın o ışığı iyice göstermesiyle de yol artık umutta taşıyordu. Yazarlar şiir, roman, hikaye dili ile mesaj verir veya kendilerini ifade ederler, resmin dili nedir? Resmin dili, ressamın fırçayı tuval üzerinde en iyi şekilde dans ettirmesidir. Evrensel bakışınız ne derece geniş bir birikim içeriyorsa fırçanızdan akan her çizgi



o olgunlukta belirir ve mesajınızı en doğru şekilde ortaya koyar.

Bir ressam temayı nasıl işler?

– Ressam temayı hissettirmediği sürece başarılı bir yapıt ortaya çıkmaz. Yaptığım her resmin içine girdim. İçine girdiğimi hissettiğim her resim mutlu etti. Hüzünü, acı'yı yansıtsam da, bunu doğru bir üslûpla ortaya koymusam eğer bu hüzünde olsa ortaya başarılı bir eser çıkmışsa işte benim mutluluğum bu oluyor.

Küçük bir kasabada ressam olmanın, bayan ressam olmanın bizim toplumumuzda, küçük yörende avantaj ve dezavantajları var mı? Sanatsal anlamda yaptığım çalışmalar adına yurtdışında yaşayan son jenerasyonun yabancılışmasının asıl temam olmasından kaynaklı avantaj, yalnız

gelşim adına dezavantajlarında çok. Bayan olarak sadece resim değil, ne yaparsanız yapın halâ bayanın çalışma hayatında yer alması aşina bir durum değil. Kadın, toplumda sadece kendinden bekleneni uygulayan bir varlıkken, konuşan, başarılı, üreten, kendini ifade etmekten çekinmeyen kısacası bir erkekle eşit konumda yer almak. Ki yadırganması doğal, gerçi tamamen olmasada takdirde görüyor. Asıl dezavantajım ilk olmak, insanlar burada resimle ilk kez tanışıyor ve zaruri bir ihtiyaç olmayışı da daha anlamsız kılıyor. İnsanımız yemedikleri, üzerine hali gibi basıp gezmedikleri, giymediği, takip takıştırmadıkları yani gösteremedikleri hiçbir şeyi anlamazlar, anlayamazlar. Her şeyin ilkinde olduğu gibi zaman gereklili ve ne anlam ifade ettiğini bilmelerini sağlamak adına ki görevse elbette her sanatçıda olduğu gibi sanatçıya, bura-daysa bana düşüyor bence.

Vekil öğretmenlik yaparken birden bire atölye açıp asıl mesleğe atıldınız, sorunlarınız neler oldu?

– İnsan asıl meslekte başarı sağlar, sorunlardan ziyade insanlar uzun süre şaşkındılar zaten, bu ne ya! dediler, hangi ihtiyaçlarını karşısındaki hesabını yaptı birçok insan, ne olduğunu öğrenmekten çok. Her anlamda atölye açmama en etkili olanlar hatta yaşadığım acabaları kafamdan silen Dr. Mehmet Özsoy ve vekil öğretmenlik yaparken dostum ve yine aynı okulda

vekil öğretmenlik yapan Gülşirin arkadaşım oldu, hayatmdaki bu ilkin de başrollerinde onlar oldu.

Buradaki çalışmalar sizi tatmin ediyor mu?

– Sipariş usulü olduğu için manevi bir tatmin olmuyor özel sanatsal çalışmalarım dışında. Yalnız şunu belirtmekte fayda var, her sipariş değil, gerçekten farklı, sanatsal anlamda ve kendi dallarında uzman insanlardan aldığım siparişler bana büyük hazırlıyor, diğer türlüyse 1,5 yıl olmasına rağmen maddi ve manevi büyük bir gelişme var, bu da burası için ilginç ve yeniliğe açıktır anlamına da geliyor.

